# DÎROK

## NAVÎN

# 1

## AMADEKAR

**Egîd Nasiro**

**Mihemed Elî**

## LÊVEGER

***Remezan Hemo***

***Narîman Ehmed***


**Ev pirtûk, ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

## BEŞA 1

DÎROK ÇI YE Û ÇIMA EM FÊRÎ DÎROKÊ DIBIN? ... 8
RÊBAZÊN LÊKOLÎN Û DESTGIRTINA ZANISTA DÎROKÊ ... 12

## BEŞA 2

DÎROKA CIVAKA XWEZAYÎ ... 17
DÎROKA MIROVAHIYÊ ... 19
DÎROKA CIVAKBÛYÎNÊ ... 21
NEOLÎTÎK ... 26
ÇANDA TILHELEF ... 35
DI CIVAKA XWEZAYÎ DE CIH Û GIRÎNGIYA MEZOPOTAMYA ... 37
DÎROKA ÇÊBÛNA QEBÎLE Û EŞÎRAN ... 39

## BEŞA 3

DERBASBÛNA DEMA BAVIKSALARIYÊ ... 47
DI DIROKÊ DE KOLONÎKIRIN Û MÎNAKÊN DESTPÊKÊ ... 48
ŞARISTANÎ ÇI YE? ... 52
ŞARISTANIYA SUMERAN ... 55
PÊŞKETINA RÊVEBERIYA BAJÊR Û ÇÎNAYETÎ ... 58
DI DEMA SUMERAN DE ZAYENDPERESTIYA YEKEM ... 60
ŞARISTANIYA EKAD ... 63
ŞARISTANIYA ASÛR ... 66
ŞARISTANIYA ÇÎNÊ ... 70

## BEŞA 4

LI MEZOPOTAMYAYÊ LI DIJÎ ŞARISTANIYA NAVENDÎ,
DÎROKA BERXWEDANA ETNÎSÎTEYAN ........................................ 76

HÛRÎ ........................................ 78

GÛTÎ ........................................ 81

MÎTANÎ ........................................ 87

ÛRARTÛ ........................................ 89

DI NAVA VAN CIVAKAN DE RÊVEBERTÎ ........................................ 93

## BEŞA 5

DÎROKA MEDAN ........................................ 97

ŞÊWEYÊ GIŞTÎ YÊ SAZÛMANIYA EŞÎRÊN KURDAN ........................................ 100

KONFEDERASYONA MEDAN ........................................ 104

Keyakser ........................................ 108

BANDORA BAWERÎ-OL Û ÇANDA ZERDEŞT A LI SER MEDAN ........................................ 110

DEMA MED-PERS ........................................ 116

ŞERÊN PERS-GREK (YEWNAN) Û ENCAMÊN WAN ........................................ 121

ÎSKENDER Û HELENÎZM ........................................ 123

IMPARATORIYA ROMA-1 ........................................ 126

IMPARATORIYA ROMA-2 ........................................ 129

LI HEMBERÎ KOLEDARIYA IMPARATORIYA ROMA BERXWEDANÊN GELAN........ 132

KOMAGENE (COMMANGENES)........................................ 133

DEMA IMPARATORIYA SASANIYAN........................................ 138

# BEŞA 1

## DÎROK ÇI YE Û ÇIMA EM FÊRÎ DÎROKÊ DIBIN?

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1- Li gorî xwe, pênaseyekê bide dîrokê.

2- Çima fêrbûna dîrokê girîng e ?

3- Jêderên dîrokê çi ne? Vebêje.

4- Ji bo ku nêrîneke rast a dîrokî bê nivîsîn, çi qonax pêwîst in?

## A) DÎROK ÇI YE Û ÇIMA EM FÊRÎ DÎROKÊ DIBIN?

**Dîrok:** Di dema borî de, di cihekî de, bûyerên ku diqewimin ji aliyê sedem û encamê ve lêkolîn dike.

Çîroka pêşketina mirovahî û gerdûnê vedibêje. Civaka mirovahiyê, li kû, çawa û kengî jiyaye, lêkolîn dike. Pira di navbera dema borî, niha û dema bê de saz dike.

Hizir û bîrên civakê û dewlemendiyên me, bi me dide nasîn. Zanista dîrokê, zanisteke ku rola rastiya civakê dide têgihandin, pêşketina baweriya wan a cewherî û hilbijartina wan a riya rast pê dide qezenckirin.

Ji bo nasîna hebûna xwe ya dîrokî, ji bo têgihandina roj û pêşeroja xwe, her wiha ji bo afirandina jiyana rast û azad, em fêrî dîrokê dibin.

### Di ronîkirina bûyerên dîrokî de xalên bingeh bên girtin:

#### Girîngiya Cih û Demê:

Bûyerên dîrokî, di dem û cihên diyar de derketine holê. Derdorên erdnîgarî û mercên xwezayî yên ku civakan jiyayîn, pir girîng in. Awayê jiyanê û pêşketinên wan, girêdayî rewşa wan a dîrokî ye. Di encama vê yekê de li cihên cuda , dîrok bi awayên cuda û xweser herikiye. Tiştek bê dem û cih nabe.

Mînak: Neolîtîkê 12.000 sal B.Z li Kurdistanê dest pê kiriye.

Di vê mînakê de du tişt girîng in; yek, B.Z 12.000 sal, du, kurdistan. Ev têkiliya cih û demê ya bi hev re diyar dike.

Cih û dem bi hev ve girêdayî ne, ku ji hev werin qutkirin, tu wateya wan namîne.

## Girîngiya Peywendiyên Sedem û Encamê:

Di pêkhatina her bûyereke dîrokî de bi misogerî sedemek an jî hinek sedem hene. Sedemên bûyeran weke bûyerên ku mirovan afirandî û bûyerên xwezayî, di bingeh de dibin du beş:

-Bûyerên ku mirovan afirandî, bi bûyerên xwezayî ve ango bûyerên ku ji derveyî xwestek û daxwazên mirovan pêk tên re, ji nêz ve peywendiyên xwe hene. Bi erênî an nerênî her bûyerek çêdibe, bi xwe re encamên cur bi cur pêk tîne.

Mînak: ji ber ku ax, av, parastin û kevneşopiya civaka xwezayî di nava hevsengiyê de, li Kurdistanê dihat jiyîn, Şoreşa Neolîtîkê pêş ket û di encamê de, di tevahiya formên jiyanî yên cîhanê de guhertin çêkir.




## B) GIRÊDANA ZANISTA DÎROKÊ BI ZANISTÊN DIN RE

Hemû şaxên zanistan ji hev sûdê digirin. Zanista dîrokê jî, yek ji van şaxên zanistê ye ku sûdê ji gelek zanistên din digire.

**Zanistên ku bi zanista dîrokê re dibin alîkar, mirov dikare wiha rêz bike:**





1) Arkolojî
2) Dîroka Hunerê
3) Felsefe
4) Aborî
5) Civaknasî-Komelnasî
6) Antoropolojî
7) Erdnîgarî
8) Fîlolojî
9) Paleografya
10)Etnografya
11) Dîplomasî
12) Dirav
13) Kronolojî.









**Pirsên nirxandinê:**

1- Valahiyên li jêr, bi gotinên guncaw dagire.

Di ronîkirina dîrokê de xalên bingehîn:

Girîngiya ..........................

Peywendiyên ....................

2- Di dîrokê de girîngiya demê, çi ye?

3- Pênc zanistên ku dîrok jê sûdê werdigire, binivîse.

4- Gelo, dibe ku bûyerek bê sedem çêbe? Têkiliyên di navbera sedem û encamê de şîrove bike.

## C) RÊBAZÊN LÊKOLÎN Û DESTGIRTINA ZANISTA DÎROKÊ

Di lêkolînkirina dîrokê de, pêwîst e ku dîroknas hinek rêbazên zanistî bi kar bîne. Li gorî vê yekê jî:

### Qonaxên Nivîsîna Dîrokê:

#### a) Peydakirina belgeyan

Dîroknas li gorî qada pisporiyê, dema ku di derbarê bûyereke dîrokî de lêgerînê dike, neçar e tevahî jêderên ji bo mijara ku lêkolîn dike pêwîst in, li gel hev kom bike. Ev, piranî dibin du beşên bingehîn:

#### 1) Jêderên Destê Yekem:

Tevahî kavil û avahiyên ji demên derbasbûyî mane, tevahî kel û pelên nirxê wan ên hunerî heye yan jî tuneye, alav, çek û nivîsên kevn, salname û tevahî belgeyên nivîskî (nivîsên arşîvan, tapo û lênûskên tomarkirinê), dirav, madalyon û muhr jêderên dîrokî yên destê yekem in.

#### 2) Jêderên Destê Duyem:

Nivîsên dîrokî yên ku di demên borî de hatine nivîsîn in. Ango “pirtûkên dîrokî” ne. Dema pêwîst be ji deskeftiyên felsefî, wêjeyî, dadî û erdnîgarî jî sûd tê wergirtin. Wekî din, helbestên dîrokî, çîrok, efsane û destanên koka wan diyar an jî ne diyar, lê dev bi dev heya roja me hatine û nehatine jibîrkirin jî hene. Ji van re jî “jêderên devokî” tê gotin. Pirtûkên dîrokî yên destpêkê, ji sedsala 5'an B.Z û pê de hatine nivîsîn.

Li gorî awayê nivîsînê, çend cureyên "dîroka hatî nivîsîn" hene:

### 1- Dîroka Biçîrokî (mîtolojî)

Vegotinên dîrokê yên bi awayê efsaneyî ne. Dema ku tê gotin dibe ku tiştên li derveyî hêza mirov û ne pêkan tê de hebin, lê ew bi xwe di bingeh de, rastiyên civakî vedibêjin.
Ev rêbaz heke ku berî wê dest pê kiribe jî, bi awayekî nivîskî di dema sumeran de, dest pê kiriye. B.Z nêzî salên 3,000 û şûnde dest pê kiriye.

### 2- Dîroka Kronîk

Ev curenivîsa dîrokê, weke "salnameyên qralî" yên Rojhilata Navîn a kevn e. Di vê cureyê de bûyerên her salekê, bêyî ku di navbera wan de peywendiyek bê sazkirin, li pey hev hatine rêzkirin.

### 3- Dîroka Lêkolîner


Bingehê zayîna dîrokvaniya roja me pêk aniye. Ji sedsala 19'an û pê de, weke zanistekê hat pejirandin. Dîrok jî, weke çengekî zanistê bi rêbaz û zagonên lêgerîn û pêşxistinê ve hat girêdan.

### b) Veqetandin, Rexnekirin û Çareseriya Zanînan

Di vê qonaxê de, di navbera jêderên cur bi cur ên hatine komkirin de, bi armanca pêkanîna sentezeke nû, zanist ji hev tên cudakirin, rexne pêş dikevin û çareserî tê pêşinyarkirin.

## Pirsên nirxandinê:

**1-** Valahiyên li jêr, bi gotinên gunaw dagire.




2- Kê bi awayê çîrokî, dîrok nivîsiye? Diyar bike.

3- Di peydakirina belgeyên dîrokî de, jêderên destên yekem û duyem zelal bike.

## PIRSÊN NIRXANDINA BEŞÊ

1- Pênaseya dîrokê bi kurtasî, çi ye ?

2- Zanistên ku bi zanista dîrokê re dibin alîkar, binivîse.

3- Peywendiya dîrokê ya bi aborî û komelnasiyê re veke.

4- Bi çi rêbazî dîrok tê lêkolînkirin?

5- Mîtolojî çi ye? Mînakekê li ser bide.

6- Dîroka nivîskî, çi ye ?

7- Çend cureyên **"dîroka hatî nivîsîn"** hene?

# BEŞA 2

## DÎROKA CIVAKA XWEZAYÎ

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1- Kîjan nav rast e, "Çand û Zimanê Aryen " yan "Çand û Zimanê Hind-Ewrûpa"? Lêkolîn bike.

2- Di civaka xwezayî de mirovan baweriya xwe bi çi tanîn? Lêkolîn bike.

3- totem çi ye, lêkolîn bike?

4- Di dema Neolîtîkê de pere tunebûn, mirovan li şûna pereyan çi bi kar tanîn? Lêkolîn bike.


5- Gelo tu dizanî, klan ji çend kesan pêk dihat?

6- Weke Xirabreş hinek derên din jî hene, navê çar cihan binase?

7- Neolîtîk tê çi wateyê? Lêkolîn bike.

8- Gelo tu dizanî, ''Hîlala Zêrîn-Kevana bibereket'' li kû ye? Lêkolîn bike.

## DÎROKA CIVAKA XWEZAYÎ




**Hin dîmenên civaka xwezayî**




## 1) DÎROKA GERDÛNÊ

Di salên dawî de mirovên zanyar hemfikir in ku temenê gerdûnê yê texmînî nêzî 14 milyar sal e, temenê cîhanê digihêje 5-6 milyar sal. Beramberî vê, dema mirov li dîroka jiyana mirovahiyê dinêre, gerdûna ew qasî kevn mirov dikare bêje 'nû ji dayîk' bûye. Gerdûna me her tim di guherîn, tevger, pêşketin û firehbûnê de ye. Ji pêvajoya çêbûna Gerdûnê heya niha, gelek zindî çêbûne. Hinek ji van tune bûne û hinek jî hîna hebûna xwe didomînin. Mirov jî, yek ji van cureyên zindiyan e ku tê gotin beriya 7 milyon sal li ser rûyê cîhanê peyda bûye.



.

Ji dema avabûna gerdûnê û heya roja me ya îro, ji bo tevahiya zindiyan pêvajoyeke girîng û dewlemend hatiye derbaskirin. Hemû zindiyan di nava hevsengî û hevpariyê de hebûna xwe domandine. Her ku dem derbas bûye, dewlemendiyên cur bi cur ava bûne. Zindîbûn ji yek şaneyê

derbasî milyonên şaneyan bûye. Ji yek rengî, bi milyonan reng ava bûne. Her hebûnê, xweseriyeke xwe ava kiriye. Bihevrebûna hemû zindiyan, avakirina wan a dewlemendiyan û pêşketina wan, bûye dîroka gerdûnî û heya roja me ya îro didome. Di gerdûnê de her tişt zindî ye. Li gorî xweseriya xwe, zindîbûna xwe diparêze. Ji bo parastina xwezaya xwe, hemû cefa û zehmetiyên serdeman, jiyane. Li hemberî van zehmetiyan, fêrî çanda xweparastin, xwetêrkirin û xwezêdekirinê bûne.

## 2) DÎROKA MIROVAHIYÊ

### Jiyana mirovên destpêkê:

Di derbarê jiyana mirovan de nêrînên cur bi cur hene, lê me ji nivîsên dîroknas (Gordon Childe) bi taybet hinek girtine ku wiha didomîne: "Mirov kengî fêrî pêxistina agir bûye, nayê zanîn. Mirovên despêkê bi hev ve anîna kevir, an jî firkandina du qetên daran dibe ku agir bi dest xistibin. Mirovên despêkê debara xwe bi çi dikir? Ew jî baş nayê zanîn. Lê li gorî nêrînên hevbeş wan şînatî, fêkî û hêk kom dikirin û ji binê erdê kokên şînatiyan derdixistin; nêçîra lawirên kovî û balindeyan dikirin. Masî û marmarîşok digirtin.. Her wiha, cil û bergên xwe ji kevil-postên lawiran û pelên daran çêdikirin.

**Pirsên nirxandinê:**

1- **Bersiva rast hilbijêre:**

- Temenê gerdûnê yê texmînî

A) 5 milyar sal B) 10 milyar sal C) 14 milyar sal

- Hatina mirovan a li ser rûyê cîhanê beriya niha bi:

A) 5 milyon sal B) 7 milyon sal C) 9 milyon sal

- Temenê cîhanê vedigere beriya niha bi:

A) 5-6 milyar sal B) 8-9 milyar sal C) 9-10 milyar sal


2- Zindî, li hemberî zehmetiyan fêrî kîjan çandê bûne? Binivîse.

3- Mirovên destpêkê debara xwe bi çi dikirin?


## 3) DÎROKA CIVAKBÛYÎNÊ

Pêvajoya civakbûna mirovahiyê, dûr û dirêj e. Civaka destpêkê ya mirovan tê texmînkirin ku beriya niha 5-7 milyon sal pêk hatiye. Civakbûyîn di du pêvajoyan re derbas bûye:

1- Civaka xwezayî




2- Civaka bi dewlet



1- Civaka xwezayî:

Ji berî 7 milyon sal dest pê kiriye û heya B.Z 4,000 sal berdewam kiriye. Di vê demê de, civakê bi rengê klan û qabîle xwe rêxistin kiriye. Bi rêbazê demokratîk û komînal jiyana xwe domandiye.

Di lêkolînkirina dîrokê de dîroknasan rêbazên cur bi cur pêş xistine. Her dîroknasekî li gorî nêrînekê dîrok pênase kiriye. hin dîroknasan li gorî amûr û berhemên ku civakê çêdikirin, dîrok dabeş kirine. Li gorî vê jî nav li serdemên dîrokê kirine. Ev navlêkirin wateya jiyana wê serdemê ji her aliyan ve venake, lê ji bo hêsan têgihîştina wê serdemê navlêkirinek e û tenê dîrokê ji aliyekî ve dide nasîn. Li gorî vê civaka xwezayî li ser sê serdeman hatiye dabeşkirin:

**1- Paleolîtîk (Serdema Kevirî ya Kevn ji 7 milyon -ta B.Z 20.000) sal.**

Paleolîtîk peyveke latînî ye. Paleo: Tê wateya "kevn".

Lît: Tê wateya "kevir". Îk: Bi wateya lêvegerandinê tê bikaranîn. Ev bi hev re tê wateya serdema kevirî ya kevn.

Di vê demê de mirov bi awayê klan (ji 20 – 30 kesî) jiyaye. Bi komkirina şînatiyan û nêçîrvaniyê debara xwe kirine. Di klanê de bi awayekî xwezayî bi hevrebûneke wekhev dijîn. Her kes li gorî hebûna xwe xwedî rolekê ye û hev temam dikin. Hemû bi hev re wateyê didin jiyanê. Ji bo wê jî jiyana wan jiyaneke komînal û demokratîk e.

Mînak: kesên bi temen bi zanabûn û tecrûbeya xwe di nava civakê de xwedî roleke mezin in. Jin di aliyê aborî, komkirina şînatiyan, ji bo berdewamkirina nifşên mirovahiyê û ji bo parastina jîngehê roleke jiyanî dilîze. Zarok nifşên mirovahiyê yên pêşerojê îfade dikin. Ciwan û zilam ji bo

parastin û nêçîrvaniyê xwedî rolekê ne.

Ev karbeşî bi awayekî xwezayî di nava civakê de belav bûye. Di heman demê de ev karbeşî jiyana klanê temam dike. Di jiyanê de heke yek ji van bi rola xwe ranebe, wê di jiyana civakê de lewazî û astengî derkevin. Lewra di nava civakê de her kes pîroz û xwedî nirx e.

Endamên klanê, li derveyî klana xwe nikarin bijîn. Rêgezên klanan ew bûn ku, hemû kes ji bo yek; yek ji bo hemû kesî bû. Ne gengaz e ku endamên klanan ji hev bên qutkirin. Di navbera endamên klanê de cudahî tuneye. Kes xwe di ser kesê din re nabîne. Her kes dikare nêçîrvanî û lawirvaniyê bike û şînatiyan kom bike, lê bi hev re parve dikirin. Ev berhevkirin hemû ji bo jiyana klanê bû.

Li gorî lêkolînên hatine kirin, heya piştî pêvajoya qeşayê, mirov bi şêweyê klan a ku ji 20-30 kesî pêk dihat, dijiya. Fosîl diyar dikin ku ev di şkeftan, giravên nava deryaçeyan û holikên li ser stûnên daran hatine çêkirin de diman. Çek û amûrên ku ji kevir, hestî û daran dihatin çêkirin, bermahiyên herî girîng ên wê pêvajoyê ne. Xwedîtî û malbata taybet hîn çênebûbûn. Ji ber ku klan bi xwe, malbat e.



Her tiştî weke xwe zindî dibîne û bi wan re di nava hevkariyê de ye. Rêzdariyeke mezin nîşan dida. Klanan bi totemên xwe baweriya xwe pêş dixistin. Totem, wekî nas-nameya van klanan e.

Di vê serdemê de mirovan bi zimanê jest û mîmîk( tevgerên rû, dest û mil û hwd.) ji hev fêm dikirin.


Li gorî dem û cih bikaranîna kevir, hestî û daran cuda cuda pêş ketiye. Di despêka vê serdemê de kevir weke heyî hatiye bikaranîn. Bi demê re li gorî tecrûbe, şert û mercên jiyanê zanabûna mirovan pêş ketiye û di karanîna kevir, hestî û daran de, ber bi hostetiyê ve çûne.







## Şkefta Şanîdar:



Li başûrê Kurdistanê di navbera bajarê Rewandoz û Diyana de, li kêleka Ava Zapa Mezin cih digire. Ji Serdema Paleolîtîk heya Neolîtîkê ji bo klan û civakê bûye cihê xweparastin û cîwarbûnê. Li gorî lêkolînan bermahiyên Şanîdarê digihêjin B.Z 65 hezar sal.

### Pirsên nirxandinê:

1- Mirovên destpêkê, çawa xwe tîmar dikirin?

2- Klan, çi ye? Şîrove bike.

3- Têkiliya mirov a bi civakê re çi ye?

4- hevokên rast bi (R) û yên şaş bi (Ş) nîşan bike:

- Civaka Xwezayî berî 7 milyon sal dest pê kiriye. ( )
- Şkefta Şanîdarê li bakurê kurdistanê ye ( )
- Mirov, hebûneke aborî ye. ( )
- karbeşî bi awayekî xwezayî di nava civakê de çêbûye ( )

## Mezolîtîk (Serdema Kevirî ya Navîn 20.000 -12.000 B.Z)

Mezolîtîk: Peyveke latînî ye. Mezo: Tê wateya navîn. Lît: Tê wateya kevir. Îk: Bi wateya lêvegerandinê tê bikaranîn. Ev bi hev re tê wateya serdema kevirî ya navîn.

Ev serdem ji 20,000 salan B.Z dest pê dike û heya 12,000 salan B.Z dewam dike. Ev serdem weke serdema qeşayê ya dawî jî tê nasîn.



Mirov dikare serdema Mezolîtîkê weke pira derbasbûna di navbera Paleolîtîk û Neolîtîkê de bi nav bike.
Di vê serdemê de bi pêşengiya jinê di encama tecrûbeyên hezarên salan ên ji komkirina şînatiyan derxistine, di navbera mirov û axê de girêdan çêdibe. Têkiliya di navbera tovên şînatiyan û axê de tê nasîn. Ev zanabûn  dê bi mirov re di demên pêş de bibe bingeha çandiniyê.


Her ku zanabûn pêş ketiye û pêwîstiyên jiyanê zêdetir bûne, di çêkirina amûran de jî pêşketin çêbûye, ji ber vê jî di vê serdemê de gelek amûr û alavên nû hatine vedîtin.

## Pirsên nirxandinê:

1- Mezolîtîk (Serdema kevirî ya Navîn) çend hezar sal dirêj kiriye?
2- Mezolîtîk çawa tê nasîn?
3- Mezolîtîk tê çi wateyê?

## Neolîtîk (Serdema Kevirî ya Nû 12.000 - 6.000 B.Z)

Neolîtîk peyveke latînî ye. Neo: Tê wateya "nû". Lît: Tê wateya "kevir". Îk: Bi wateya lêvegerandinê tê bikaranîn. Ev bi hev re tê wateya serdema kevirî ya nû. Hemû dîroknas, arkeolog û zanyar hemfikir in ku şoreşa Neolîtîkê li Kurdistanê pêş ketiye. Di dîrokê de ev herêm bi navên Hîlala Zêrîn, Kevana Bibereket an jî Mezopotamya jî tê binavkirin.




Nexşeya Mezopotamya-Kevana Zêrîn (Biberhem)

Şoreşa Neolîtîk li ser sê bingehan digihêje wateya xwe:

1- Çandinî
2- Avakirina gundan
3- Kedîkirina lawiran

## 1- ÇANDINÎ:

Di cîhanê de cara yekem çandinî li Kurdistanê pêş ketiye. Mirovan despêkê genim, ceh û nîsk çandine. Her sê berhem jî nêzî deh hezar sal berê li Rihayê (bakurê Kurdistanê) hatine çandin.

## 2- AVAKIRINA GUNDAN:

Di cîhanê de gundên herî kevn yên ku arkeologan vedîtine li Amed – Erxenî – çayonû (bakurê Kurdistanê) ne. Nêzî 11,000 sal berê hatine avakirin.

## 3- KEDÎKIRINA LAWIRAN:

Li gorî lêkolînan kedîkirina lawiran despêkê li kurdistan û xeta filîstînê (kenan) pêş ketiye. Nêzî 11,000 sal berê bizin, mih, çêlek, kûçik û piştre jî hesp di demên cuda cuda de hatine kedîkirin.

**Pirsên nirxandinê:**

1- Serdema Neolîtîkê li ser kîjan bingehan ava bûye?
2- Peyva Neolîtîk tê çi wateyê?

3- Hevokên rast bi (R) û yên şaş jî bi (Ş) nîşan bike:

- Serdema Neolîtîkê 8.000 sal dirêj kiriye. ( )

- Gotina Neo; tê wateya kevirê nû. ( )

- Şoreşa Neolîtîkê li Kurdistanê pêş ketiye. ( )

## Li Mezopotamya Çend Navendên Neolîtîkê:

### Perestgeha Xirabreş:




Li bakurê Kurdistanê nêzî gundê Xirabreşkê yê ku 15 km. bakurê bajarê Rihayê cih digire. Di destpêka Serdema Neolîtîkê de weke perestgeh hatiye bikaranîn. Li gorî lêkolînan bermahiyên Xirabreş digihêjin B.Z 12 hezar salan. Di dîrokê de Xirabreş weke perestgeha yekem hatiye dîtin.





### Gundê Çemê Koteber:

Li bakurê Kurdistanê, 7 km. dûrî navçeya Erxaniyê ya bajarê Amedê li kêleka çemê Dicle cih digire. Di destpêka Serdema Neolîtîkê de bûye navendeke cîwarbûnê. Li gorî lêkolînan bermehiyên Çemê Koteber digihêjin B.Z 11 hezar salan. Bi mîmariya avabûna gund balkêş e.



Çemê Koteber

Di sala 1963'yan de, di encama kolanên hatine kirin de hatiye dîtin ku ev qad bûye qada herî kevn a bicihbûnê. Şoreşa Neolîtîk mirov dikare bêje; şoreşa çandinî û gundîtiyê li gel hemû taybetmendiyên xwe li vê derê jiyaye. Hinek destkeftiyên ku pêşketinên girîng ên ku mirov dikare pênaseya destpêkên dîrokê lê bike, hatine bidestxistin. Li vê derê mirovahî ji nêçîrvanî û komkirinê derbasî çandinî, kedîkirina lawiran û şivantiyê bûye. Di serî de mih û bizin û hinek lawir hatine kedîkirin û diyar bûye ku hinek berhemên çandiniyê yên weke genim û ceh hatine çandin. Libên genim ên di kolanan de hatine bidestxistin, diyar dikin ku di 8.500 salî B.Z de hatine çandin.


Her wiha di encama kolanê de tiştên ku derketine, diyar dikin ku ev der weke gund hatiye sazûmankirin. Şkeftên bi wêne û yên bêwêne hatine dîtin. Malên di keviran de hatine çêkirin, hene. Hinek malên ku avahî li ser pêk hatine jî, hene. Wekî din hinek cihên perestgehan ên dekorasyona hundir hîn bi rêk û pêk hatine çêkirin, hatine dîtin. Li Newala Çorê û Xirabreşê jî, rastî cihên wisa tên. Belgeyên di kolanan de hatine bidestxistin, diyar dikin ku li vê derê navenda bazirganiyê ya yekem hatiye çêkirin. Her wiha, peykerokên bi kîl hatine çêkirin, diyar dikin ku li vê derê gelek pêşketinên hunerî çêbûne.

## Gundê Çemê Xalan:




Li bakurê Kurdistanê, li bakurê bajarê Êlihê li ber ava Dicle cih digire. Di destpêka Serdema Neolîtîkê de navendeke sereke ya cîwarbûnê ye. Li gorî lêkolînan bermehiyên Çemê Xalan digihêjin B.Z 11 hezar sal. Navenda ku herî zêde di çêkirina firaxên seramîk ên biwêne de balkêş e.

## Gundê Newala Çorê:



Li bakurê Kurdistanê, li rojavayê navçeya Hilwanê a bajarê Rihayê li ber Çemê Qentarê ku diherike ser Çemê Firatê cih digire. Di destpêka Serdema Neolîtîkê de navendeke hilberîner a zeviyên çandiniyê ye. Di mîmariya xwe de dişibe Çemê Koteber

Bi çêkirina bendavan, ev berhem di bin avê de mane. Tiştên di kolanan de hatin dîtin, diyar dikin ku weke gundîtî jiyane. Di kolanan de diyar bûye ku di binî de şopa pêvajoya Neolîtîkê, li ser jî şopa pêvajoya Romayê heye. Ev destkeftî, diyar dike ku di vê qadê de pêvajoyeke demdirêj a hezarê salan li vê derê jiyana xwe domandiye. Li vê derê çandinî pêk hatiye, lawir hatine kedîkirin, diyar bûye ku li vê derê genim, nîsk û bezelye hatine çandin.


Berhemek Ji Newala Çorê

Tiştên li Newala Çorê hatine dîtin, diyar dikin ku li vê derê cîwarbûn pêk hatiye. Avahî, bi blokên ji kevir, herî û di nava sazûmaniyekê de hatine çêkirin. Tiştên li vê derê hatine

dîtin, wê dibe ta dîroka 10.000 salî B.Z Dîsa peykerên jin, mêr û lawiran, ên ji kîlê hatine çêkirin, hene. Hinek peykerên lawirên ji gêçê hatine çêkirin jî hatine dîtin.

Di erdkolanan de hinek tiştên ji sifir ên dîroka 7.500 salî B.Z hatine çêkirin, hene. Dîtina morîkên ji sifir ên hatine siqakirin, diyar dike ku mirovên li vê derê pir ne li pêş be jî, lê ji kanzayê baş fêm kirine.


Gundê Çermo:

Li başûrê Kurdistanê 35 km. rojhilatê bajarê Kerkukê. Di Serdema Neolîtîkê de bûye navendeke sereke ya çandiniyê. Li gorî lêkolînan bermehiyên gundê çermo digihêjin B.Z 7 hezar sal.



**Heskîf, yek ji kevnareyên dîrokî yên Kurdistanê**

## ÇANDA TILHELEF (6.000-4.000 B.Z)




Tilhelef li Rojavayê Kurdistanê 3 km. rojavayê bajarê Serê Kaniyê li ber ava Xabûrê cih digire. Di Serdema Neolîtîkê de navendeke sereke ya çanda Arî ye. Li gorî lêkolînan bermahiyên Tilhelefê yên detpêkê digihêjin 9 hezar sal B.Z
Di heman demê de weke pêvajoya sazîbûyînê jî, tê binavkirin. Iûtkeya çanda Neolîtîkê ye û bi piranî bi çandiniyê re mijûl bûye. Ji bo şaristaniyê bingeh ava kiriye. Bi taybetî, çanda El Ubeyd û Sumer ji vê çandê gelek sûd wergirtiye. Gelek amûrên ku şaristaniyê ava kirine, ji aliyê vê çandê ve hatine afirandin. Ev çand, piştre li gelek cihan hatiye belavkirin. Hin cihên ku ev çand lê belav bûye, ev in: Efrîqaya Bakur, Misr, Îran, Hindistan, Çîn, Ewrûpa û Emerîka.





Gundê Tilhelef

## BANDOR Û ENCAMÊN ŞOREŞA NEOLÎTÎKÊ LI SER MIROVAHIYÊ

Şoreşa Neolîtîkê, bingeha şaristaniya Sumeran ava dike. Komên civakî yên Aryen (gelê çiyayî yên Kevana Zêrîn) û yên Semîtîk di aliyê aborî de ji hev cuda dibin. Qebîleyên weke hev in. Lê di nava xwe de eşîrên cuda ava dikin. Heya wê demê zanabûneke eşîrtî ya bi hêz pêş neketibû. Lê bingehên xwe yên etnîkî ava dikin. Pêwîstî û bandorên jiyana civakî û aborî dihêle ku ev komên civakî ber bi cudabûnê ve biçin.

Şoreşa Neolîtîkê, di navbera salên 12.000-4.000 B.Z de li herêmên Rojhilata Navîn, Anatolya, Îran, Hindistan, Çîn, Ewrûpa û li tevahiya cîhanê belav bûye.



*Civaka Neolîtîkê*

## DI CIVAKA XWEZAYÎ DE CIH Û GIRÎNGIYA MEZOPOTAMYA

Mezopotamya herêma di navbera çemên Dicle-Feratê de ye. Ji Başûrê Torosê dest pê dike, heya Kendava Besrayê dirêj dibe. Ji aliyê din ve, ji çola Erebistanê, heya çiyayê Zagrosê dirêj dibe.

Mezopotamya yekem cih-warê mirovan e. Ji ber rewşa xwe ya xwezayî û kêrhatî (destdayî), di aliyê avhewa, erd, çem û peydabûna lawir û şînatiyan de dewlemend e, ji ber vê komên mirovan ên destpêkê li ser vê xakê bi cih bûne.

Li ser xaka Mezopotamya ya bi berhem gundên destpêkê hatine avakirin, amûrên destpêkê hatine çêkirin û çandiniya destpêkê hatiye kirin. Bi demê re mirov zêde bûn û gund fireh bûn, bajar û bajarok jî derketin holê.

### Pirsên nirxandinê:

1- Çanda Tilhelef şîrove bike?

2- Di kolanên ku li derdora Çemê Koteber hatine kirin de, çi hatiye dîtin?

3- Gelo jiyan li Çemê Koteber çawa bû? Şîrove bike.

4- Dîtina tiştên ji sifir di Newala Çorê de, tê çi wateyê?
5- Tu ji Xerabreşê, fêrî çi bûyî?

6- Bandora Şoreşa Neolîtîkê ya li ser mirovahiyê çi bû? Binirxîne.

7- Bersiva rast hilbijêre.

-Xerabreş, li nêzî

A) Amedê ye B) Çemê Koteberê ye C) Rihayê ye

- Tilhelef, nêzî çemê

A) Xabûrê ye B) Zêyê ye C) Feratê ye

8- Cihên vala di nexşeya têgehan de, bi gotinên guncaw dagire.

3 Tiştên ku li ser xaka Mezopotamya ya biberhem hatine afirandin:

..............................

..............................

..................................

5- Kevana Zêrîn li ser nexşeyê çêke.



## DÎROKA ÇÊBÛNA QEBÎLE Û EŞÎRAN


Qebîleyeke Efrîqayî

Qebîle û eşîret, ji nîşanên herî girîng ên civakî ne. Bêhtir di civaka çandinî û gund de pêş ketine. Malbatan jî digirin nava xwe, heman ziman û çandê dijîn. Yekîneyên civakî yên pêwîst ji bo hilberîn û parastinê ne. Qebîle û eşîret ji hêzên avaker ên dîrokê ne.

Klan û malbat, dema çareserkirina pirsgirêkên hilberîn û ewlekariyê têrê nakin, pêwîst dîtine ku xwe veguherînin awayê qebîleyan. hêmanên dendik ên civakê ne, ne tenê girêdana xwînê, lê hilberîn û ewlekarî jî, ji bo wan pêwîst in. Qebîle xwe dispêre zimanê hevbeş. Nîvkoçer û nîvniştecih in. Perestgeha wan a hevbeş heye. Ji bo miriyên xwe, goristan çêkirine. Xelat ji bo hev pêşkêş dikirin. Pergala Qebîleyan piştî Klanan pergala civakî ya herî bibandor û demdirêj e.


Dîmenê Qebîleyekê

Eşîret, weke cureya fedrasyoneke komcivakên qebîleyan, zêdetir girîngiya wan hebû. Hebûnên xwe, di rêjeya mezin de, li dijî êrîşên şaristaniyên koledar, bi dest xistine. Pêdiviyên yekbûn û berxwedanê, ji bo tune nebin, rêxistingeriya eşîretê afirandine. Lê piştî ku pergalên desthilatdar bi pêş ketine, ev formên civakî hinekî ji rastiya xwe dûr ketin û desthilatdaran ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîn.

## Etnîsîte çi ye?

Etnîsîte, nîşandana nijada mirovan e. Dîroka etnîsîteyan bi Şoreşa Çandiniyê re dest pê dike. Komên mirovan ên wê demê bi tevger, ziman û çanda xwe komên etnîk in. Her komek, etnîsîteyek e. Ev komên etnîk di wê demê de wisa tên binavkirin. Dikare weke jiyana nîv–demokrasî jî were binavkirin. Etnîsîteyan, li hemberî koledariya ku li ser mirovan tê meşandin, li ber xwe dane û koletî nepejirandine. Gelê kurd, koma etnîk a Hûriyan e. Hin komên xwedî çanda Aryen ev in: Hûrî, Gûtî, Kasît, Hîtît, mîtanî, Naîrî, Urartu,  Medî û persî.

## DI SERDEMA AVABÛNA ŞOREŞA NEOLÎTÎKÊ DE CIVAKA ARYEN

Bi pêşketina civakî re ev komên çand û zimên jî pêş dikevin. Zimanê yekem ê Arî xwedî nasnameya civakî a yekemîn e. Li kurdistanê pêş ketiye û di wateya gotinê de weke cih, ax, zevî tê bikaranîn. Di heman demê de Aryen xwedî hilberînên çandiniyê ne. Di sazkirina hilberînên xwe de binavkirin û biwatekirin pêş ketiye.

Dîroka devokî bi riya çîrok û efsaneyan bi berfirehî hatiye bikaranîn. Hilberînên bingehîn, dîzik, cer, kêr, amûrên çandiniyê û gelek hilberîn hatine binavkirin. Dema ku ev tên binavkirin, bingehê zimên jî çêdibe. Cihên ku ev vegotinên devokî, li ser pêşketinên zimên hatine zanîn, weke Çemê Xalan û Çemê Koteber e. Hinek gotinên ku çavkaniyên xwe ji wê demê digirin, ev in: Geo, war, ax, zevî, jin, roj, bira, mûr, sal, neo, ga, giran, meş, guda û hwd.

Çanda Aryen a li Mezopotamyayê pêş ketiye, weke pêlên deryayê li hemû aliyê cîhanê belav bûye.



Civaka xwezayî

## Çand û Civaka Semîtîk:

Çanda Semîtîk di cewherê xwe de çanda şivantî û eşîrtiyê ye. Dema Şoreşa Çandiniyê li Bakurê Mezopotamyayê pêş dikeve, li Başûrê Mezopotamyayê jî çanda Semîtîk tê jiyîn. Çanda Semîtîk ji çola mezin heya Rojhilatê Erebîstanê û heya aliyê vê çolê yê bakur bandor kiriye. Weke berdewamiya çanda Rîfa Efrîqayê ye. Di nava çanda Semîtîk de bingeha olên yekxwedayî tê avakirin. Çanda Semîtîk li Başûrê Mezopotamyayê bi bandor dibe. Li Bakurê Mezopotamyayê Çanda Aryen heye. Çanda Aryen, çanda Şoreşa Neolîtîk e. Çanda Semîtîk, di nava komên etnîk ên Ekad, Babil, Asûr û Kenaniyan de pêş dikeve.



## Pirsên nirxandinê:

1- Bersiva rast hilbijêre.

- Etnîsîte, nîşandana

A) Malbatan e B) Qebîleyan e C) Nijadan e

- Çanda Semîtîk, çanda

A) şivantiyê ye B) eşîrtiyê ye C) A û B ne

- Di nava çanda Semîtîk de bingehê Ola

A) Pir xwedayî B) Yek xwedayî C) Totemî derdikeve.

2- Etnîsîteyê şîrove bike.

3- Çanda Aryen çandeke çawa ye? Şîrove bike.

4-Çima pêwîstî bi derketina qebîle û eşîretan hebû?

5- Çanda Aryen a li Mezopotamyayê pêş ketiye, li kû dera cîhanê belav bûye?

## PIRSÊN NIRXANDINA BEŞÊ

1- Bi kurtasî, çêbûna gerdûnê veke?

2- Mirov, kengî li ser rûyê cîhanê peyda bûne û ji kîjan herêman belavî tevahiya cîhanê bûne?

3- Civakîbûn, kengî pêk hatiye?

4- Klan çi ye?

5- Li Kurdistanê, cihên dîrokî kîjan in? Çend mînakan binivîse?

6- Berhemên Şoreşa Neolîtîkê çi ne?

7- Li Kurdistanê navê warekî mirovan ê di serdema paleolîtîkê de, binivîse.

# BEŞA 3

## DERBASBÛNA DEMA BAVIKSALARIYÊ PERGALA ŞARISTANIYAN

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1- Sîstema baviksalarî ya dema Şoreşa Neolîtîkê ye, yan a dema çanda El Ubeyd e? Lêkolîn bike.

2- Pêşketina sîstema qral-xweda-leşkeran di kîjan demê de dest pê kiriye? Lêkolîn bike.

3- Şaman-rahîb heman kes in. Ev nêrîn rast e, yan na? Lêkolîn bike.

4- Şaristaniya Sumeran, li Mezopotamyaya jêr, an li ya jor pêş ketiye? Lêkolîn bike.

5- Di dema Şoreşa Neolîtîkê de, çînayetî hebû, an na? Lêkolîn bike.

6- Zayendperestiya yekem, di dema Sumeran de li kîjan bajarî pêş ketiye? Lêkolîn bike.

7- Şaristaniya Babil, ji aliyê kîjan komên etnîk ve hatiye bidawîkirin? Lêkolîn bike.

## DERBASBÛNA DEMA BAVIKSALARIYÊ

### ÇANDA EL UBEYD




Di 5.700'î B.Z de li Mezopotamyaya jêr (li derdora bajarê Ûrûk yê ku îro di nava eyaleta Besra ya Iraq de dimîne) Çanda El Ubeyd dest pê dike, ji çanda Tilhelef bandor dibe û sûdê digire. Li beramberî çanda Tilhelefê, di heman demê de li Mezopotamyaya jêr pêş dikeve. Bi çanda El Ubeyd re dema derbasbûna baviksalariyê pêş dikeve. Pergala zayendî, bi çanda Semîtîk tê destpêkirin. Pergala dijberî çanda dayîkê ye.

Dema şef, rahîb û leşkeran tê destpêkirin. Ev çanda Semîtîk a pergala desthilatdar bi çanda jor a Mezopotamya ya Aryen, Tilhelef re dikeve nava pevçûneke mezin. Bandora xwe li çanda Tilhelefê dike. Mêtingehên xwe li wir ava dike. Bermahiyên van mêtingehan heya niha li bajarê Meletî û Elezîzê hene. Pergala xanedaniyê pêş dikeve. Di nava vê pergalê de bi riya xwînê malbatên mezin, ango xanedanî tên avakirin. Di çanda beriya wê de xanedanî tuneye. Di çanda Semîtîk de şer, desteserî û zorî heye. Desteseriya dîrokê cara yekem bi vê çandê ve girêdayî, tê jiyîn.

## DI DIROKÊ DE KOLONÎKIRIN Û MÎNAKÊN DESTPÊKÊ




Cara yekem mêtingeh di dema El Ubeyd de pêş dikeve. (mêtingehên mezin di dema sumeran de tên avakirin). Kolonî dagirkirina herêmeke welatekî din e. Çand-ziman û aboriya xwe bi riya van mêtingehan hem li wan welatên din jîndar dikin, hem jî ji wir van berheman digirin. Mêtingehên Sumeran ên Mezopotamyaya jor, çand û zimanê wir girtine û derbasî Mezopotamyaya jêrîn kirine. Avakirina mêtingehan, bingehê emperyalîzmê pêş dixe. Desteseriya demê ya çanda heyberî û rewanî bi riya mêtingehan pêş dikeve. Mêtingehên wê demê, weke qereqolên niha yên leşkerî ne. Lê bi qasî xebata leşkerî, hemû xebatên din jî, di wan mêtingehan de hatine pêşxistin. Bi çanda El Ubeyd ve girêdayî, kolonî tên avakirin. Mêtingehên bajarê Sumeran ên Ûrûkê di 3.500 B.Z de dest pê dike. Li hemberî mêtingehên Ûrûkê, li Mezopotamyaya jor çanda Tilhelefê, ango ya Şoreşa Neolîtîkê li ber xwe dide. Di pêşketinên dîrokî de ev her du çand gelek ji hev bandor dibin.

## DI PÊŞKETINA PERGALA DESHILATDAR DE ROLA QRAL-LEŞKER-ŞAMAN

Di 4.000-3.000 sal B.Z de çanda bajarê Ûrûkê ji aliyê hejmar, çand-ziman û berhemên cur bi cur ve gelekî pêş dikeve. Her yek pêvajoyeke cuda dide avakirin. Li bajarê Ûrûkê çînayetî, hiyerarşî-dewlet tên avakirin. Êdî dîroka nivîskî tê destpêkirin.

Li Mezopotamyaya jêr şert û mercên jiyanê zehmet in. Ji ber kêmbûna avê û pir zêdebûna hejmara mirovan pewîstiya çêkirina qenalên avê derdikeve holê. Her wiha ji bo avakirina bajaran û komkirina hejmara mirovan pêwîstî bi zanebûneke mezin heye. Ji bo vê, cîwarên destpêkê, bajarokên biçûk in. Bajarokên hatine avakirin, ji bo parastina êrîşên ji derve baş in. Lê belê, rêveberiyeke pispor tê xwestin. Dema rêveberiya bajaran derdikeve, burokrasî û pergala dewletê jî, dest pê dike. Bi parastina bajar ve girêdayî, artêş û leşkerî jî, pêş dikevin. Komên civakî di aliyê olî de bi vê rewşê bawer kirine. Di baweriya mirovan de şaman rola mezin dilîzin. Weke şêx û meleyên niha ne. Ev her sê taybetiyên desthilatiyê, heya roja îro tên berdewamkirin. Fermandar,pêşengên olî, rêveberên qral-wezîr û hwd. hene. Ev pergal, cara yekem li bajarê Ûrûkê tê avakirin. Di destana Gilgamêş de jî, behsa vê rewşê tê kirin.


Hewildanên Kolonîkirinê

## WATEYA ŞAMAN AN JÎ RAHÎB

Şaman an jî rahîb, zilamê oldar e. Di dema Neolîtîkê de dayîka xwedawend, pêşengiya civakê dikir. Di dema baviksalariyê de ev rola dayîkê jê tê dizîn û bi navê şaman an jî rahîban ev rol tê lîstin. Şaristaniya Sumeran a koledar, mîtolojî û têkiliyên civakê di nava dewletê de hemû ji aliyê şamanan ve hatine amadekirin. Hemû bûyer û pêwîstiyên civakî, weke fermana xwedê, derbasî nava civakê kirine. Piştî Şoreşa Neolîtîkê, ev erk hemû ji aliyê zilaman ve tên meşandin. Ji ber vê yekê, bi pisporiya şamanan serdema baviksalariyê tê berdewamkirin. Bîrdoziya pergala desthilatdar, li ser keda mirovên bindest tê avakirin.

### Pirsên nirxandinê:

1- Li ser destê kê û li kû derê, mêtingehên mezin tên avakirin?

**2-** Bersiva rast hilbijêre

- Avakirina mêtingehan, bingeha

A) Emperyalîzmê ye B) Demokrasiyê ye C) Sosyalîzmê ye


- Dîroka nivîskî, li

A)Tilhelefê dest pê dike B) Neynewayê dest pê dike
C) Ûrûkê dest pê dike

- Li Mezopotamyaya jêr, şert û mercên jiyanê

A) Zehmet in. B) Gunaw in C) Hêsan in

**3-** Di nexşeya têgehan de cihên vala, bi gotinên gunaw dagire:





**4-** Çanda El Ubeyd li kû û li beramberî kîjan çandê derketiye?

## A) ŞARISTANÎ ÇI YE?

Şaristanî bêhtir wateya çanda giştî, çîn, bajar û civaka derbasbûna pergala dewletê pênase dike. Çînbûn, bajarbûn û dewletbûn kategoriyên bingehîn ên civaka şaristanî ne. Civaka bi vî awayî civaka çînbûyî, bajarîbûyî û dewletbûyî ye.

Şaristaniya navendî ya herî kevn li peravên Dicle û Feratê, bakurê Kendava Besrayê ava bûye. Navê wê şaristaniya Sumer e.


Zîgûrat

Şaxên bingehîn ên zanista civakî yên weke: arkeolojî, etnolojî û teolojî, bi lêkolînên berfireh ên ku di sedsala borî de kirine, gihîştiye vê encamê. Civaka yekem a ku bi dewlet, xwediyê dîroka nivîskî û şaristaniyê ye, Sumerî ne. Dema em bînin ber çavan ku demeke dirêj, dîrok weke saziyên civaka bidewlet hatiye girtin, ev guherîn dibe guherîna dîrokê ya herî mezin. Bidewletbûn, bi aliyên wê yên erênî û neyînî ve, di dîroka mirovahiyê de, tê wateya gavavêtineke mezin. Dewlet mîna amûreke civakî û saziyeke berfireh, hebûna xwe di roja me de jî, bi xetên sereke didomîne. Dewlet şêweyên serdestiyê ne, ku li ser hilberîna keda mirovan a ku tê guhertin, hatine damezirandin.

## B) WATEYA ŞARISTANIYA NAVENDÎ ÇI YE?

Çanda şaristaniyê ya dema yekem ku 4.500 salî domandiye (B.Z 4000 – P.Z 500, serdema koletiyê), tevahî bûyer û pêkhateyên xwe li Mezopotamyaya jorîn û wan derdoran pêk aniye. Çanda Proto-Kurd di vê dema dirêj a duyem de erênî û nerênî di gelek pêşveçûnan de jiyaye. Di 2.000 salên destpêkê yên şaristaniyê de mirov dikare bi hêsanî bandora Hûrî, Mîtanî û Hîtîtan di asta gerdûnî de bibîne. Di çêbûna Çanda Grek û Roma de û di çêbûna têgeha Çanda Rojavayê Ewropayê de, xeleka diyarker çanda Hûrî, Mîtanî û Hîtîtan e. Wan hem tiştên bi xwe afirandî û hem mîrateya çanda Sumeriyan afirandî, derbasî Rojavayê Ewropayê û Grek-Roma kirine. Bi vî awayî, bûne xelekeke zêrîn ji bo domandina pergala şaristaniya navendî. Bêyî ku em vê xeleka zêrîn bi wate bikin, em nikarin herikîna dîrokê şîrove bikin. Eger şaristaniya navendî bi 12.000 salên Neolîtîkê û 2.000 salên şaristaniyê debara xwe nekira, me nedikarî îro behsa çanda mirovahiyê bikira ku muhra xwe li roja me ya îro xistiye.

Şaristaniya navendî bi desthilatiya navendperest re peywendîdar e. Di wateyeke din de şaristanî bi desthilatiya navendperest re ketiye ser riya xwe û diçe. Şaristaniya navendî ya 6.000 salî di heman demê de tê wateya desthilatiya navendperest.

## C) DI DEMA ŞARISTANIYAN DE BERFIREHBÛNA ÇANDÊ

Têgîna Aryen, ji nijad an jî bûyereke etnîkî zêdetir, ev nav li komên etnîk ên ku bi şoreşa çandiniyê re ajaldarî û cotyarî bingeh girtine û cara yekemîn e ku çand pêş xistine, hatiye kirin. Ev jî, rastiyeke zanistî ye ku ev komên etnîk, li kevana Toros-Zagrosê, peravên Dicle û Feratê mezin bûne û derketine holê. Civaka çandiniyê ya Neolîtîkê, di pêvajoya gihiştinê ya dirêj de, bi taybetî di navbera salên 6.000 û 4.000 B.Z (tilhelef) de rê li ber hilberîneke dewlemend û daneheveke teknîkî vekiriye.

**Pirsên nirxandinê:**

1- Bersiva rast nîşan bike

- Şaristaniya navendî ya herî kevn ava bûye, şaristaniya

A) Ekad e B) Babil e C) Sumer e

- Di çêbûna çanda Grek û Roma de, xeleka diyarker çanda

A) El Ubeyd e B) Semîtîk e C) Hûrî, Mîtanî û Hîtît e

- Şaristaniya navendî ya 5.000 Salî, di heman demê de tê wateya

A) Desthilatiya navendperest B) Demokrasî C) Netewperestî

2- Şaristanî çi ye? Pênase bike.


4- Şaristaniya herî kevin li kû derê ava bûye û navê wê çi ye?

## ŞARISTANIYA SUMERAN (4.000-2.000 B.Z)

Sumerî kî ne? Li gorî hinek zanînan, Sumer navê herêm, an jî erdnîgariyê ye. Ew komên civakî yên li ser vê herêmê bi cih bûne. Navê welatê wan jî, 'Kalama' ye. Kalama tê wateya Welat, an jî parçeyê axê.

Di pirtûka pîroz a Cihûyan Tewratê de navê welatê Sumeran bi navê Diyarên Şînar, hatiye nivîsîn. Sumeriyan ji rahîbên xwe re digotin: Patesî an jî Ensî. Ev rahîb piştre bûne xweda-qral û civaka Sumeran bi rê ve birine.

Sumerî yek ji komên civakî yên ku li Mezopotamyaya jêrîn dijiyan. Li rojhilat û bakurê Sumeran komên etnîk ên Hûriyan hene. Hûrî gelê çand-zimanê Aryen in. Li rojava û başûrê Sumeran komên Semîtîk hene. Ev kom, ji çand-zimanê Semîtîkan tên. Çand–zimanê Sumeran bi giranî li gorî vê hatiye bikaranîn.




Ew jî, weke Şoreşa Neolîtîkê, xwedî şaristaniyeke navendî ya pir mezin in. Di aliyê hişmendî de şoreşên pir mezin ava kirine. Hemû berhemên mirovahiyê yên heya wê demê hatine çêkirin û vedîtin, ji bo xwe bi kar anîne. Hem pêş xistine, hem jî xistine bin xizmeta xwe. Sumerî bi xwe zêdetir bi bazirganiyê re têkildar dibûn. Ji bo vê, hem hilberînên xwe didin derve, hem jî ji derve berhemên mirovahiyê yên nû digirin. Bajarê Nîpur, Erîdû û Ûrûk ji bo Sumeran pîroz in. Xweda û Xwedawendên wan ên mezin û balkêş Enlîl, Enkî û Înana bûn.

Di dema sumer de, di encama şert û mercên avhewayê yên guncaw de, kombûneke mirov û çandên derdorê çêbû. Di encama vê kombûna zêde de, pirsgirêkên aborî, jiyanî, hejmara zêde û hwd. derketin. Bi armanca çareserkirina van

pirsgêrkan sumeran zîgurat ava kirin. Avakirina zîguratan despêkê di aliyê rêveberiya civakê de roleke erênî lîst. Piştre zîgurat veguherîn cihê zor û deshilatdariya li ser civakê. Bi van her du aliyên xwe, yek peydakirina pêwîstiyên jiyanî yên civakê, du zordestî û deshilatdariya li ser civakê, saziya dewletê ava kirine. Bi avakirina dewletê re, êdî dewlet bûye navenda zordariya li ser civakê. Di dîrokê de her du taybetmendiyên dewletê bi hev re heya roja me ya îro hatine. Di cewherê xwe de dewlet ne saziyeke civakî ye; saziyeke ku azadiya civakê ji dest girtiye û berhemên civakê desteser kiriye.

## Avakirina Mîtolojiya Xwedayan

Di dema Sumeran de, her Xweda û Xwedawend taybetmendiyên xwe yên mirovî hebûn. Li gorî van xwedayan mîtolojî û çîrok hatine avakirin. Sumeran gelek çavkanî û mînakên dema Şoreşa Neolîtîkê yên çanda xwedawendan girtine û mîtolojiyên xwe ava kirine. Lê belê, mîtolojiyên berê li gorî xwe guhertine. Bi taybetî, ji mîtolojiya xwedawend Nînhûrsag û Înana sûd wergirtine û di heman demê de bûne jêderên mîtolojiyên ku li pey wan hatine. Mîtolojiyên din ên Hawa- Adem û mîtolojiya Gilgamêş e. Bi alîkariya van çîrokan cudahiya di navbera mirov û xwedayan de pir kûr dibe. Desteya xwedayan tê avakirin. Bi avakirina mîtolojiya xwedayan, desthilatdarî mafê destnedayînê bi dest dixe. Navê vê desteyê, panteon e. PANTEON: Bi zimanê Grekî, tê wateya desteya xwedayan.

## Pirsên nirxandinê:

1- Sumer, tê çi wateyê?

2- Sumeran ji rahîbên xwe re çi digotin?

3- Sê bajarên Sumeran bi nav bike.

4- Sumeran çavkaniyên xwe yên mîtolojîk ji kû girtine?

### Pêşketina Rêvebiriya Bajêr û Çînayetî

Ji bo têrkirin, parastina pêwîstiyên xwe û zêdekirina komên civakî, pêwîstî bi sazûmaniya gund û bajaran tê dîtin. Pêwîstî, bi rêvebiriya gund-bajaran a zana-pispor tê dîtin. Ev jî, bi riya rahîban, di perestgehan de tê avakirin. Çîroka sazûmaniya dewletê, bi van her sê pêwîstiyên civakê tê îfadekirin. Lê belê, di encama van pêwîstiyên xwetêrkirin, xweparastin û xwezêdekirinê de, pêwîstiya dewletê tuneye. rahîbên demê, sazûmaniya dewletê di zîgûratan de ava dikin. Weke zagonên xweda nîşan didin. Xwe dikin çîna jor a serdest, civakê jî dikin kole. Bi xweda û civaka bindest a kole, bîrdoziya nû ya mirovan tê avakirin.




Bi riya bîrdoziya perestgehan û mînakên baweriyê, an jî mînakên olî zihniyeta mirovan a nû tê avakirin. Bajarbûn destpêkê di mejiyê mirovan de tê avakirin. Bi hezarê salan rahîbên wê demê li ser mejiyê mirovan bandorên ew qasî mezin çêkirine. Êdî mirovan bi derewan bawer kiriye. Rahîban hemû bîrdoziya bajaran, weke mîtolojî û axaftinên xweda-qralan ji bo civakan vegotine. Mirovan bi van gotin û çîrokan bawer kirine.

### Rêveberiya Qral-Xwedayan

Beriya Sumeran komên civakî bi awayekî komînal bi hev re dijiyan. Di dema Sumeran de derbasî têkiliyên desthilatdariyê dibin. Ev, bi bandora têkiliyên serdest–bindest ve pêş dikeve. Beşeke serdest–rêveber derdikeve holê.

Berhema zêde dixe destê xwe. Beşên civakî yên din tên bindestkirin. Keda mirovan tê desteserkirin. Kesên bazirgan û sinetkar derdikevin holê. Yanî modêla rêveber-çîna jor ava dibe.

Zanist–nivîskarên Sumeran ji bo vê sîstema xwe ava bikin, bi zimanê mîtolojîk û bi baweriya mirovan, van aliyên xwe bi civakê re didin pejirandin. Van kirinên xwe jî bi navê xwedayê jor dikin. Weke sazûmaniya pîroz a xweda, koletiyê diyarî mirovan dikin. Mirovan jî bi wan bawer kirine. Serweriya bîrdozî tê avakirin. Her kes van mîtolojiyên Sumeran, weke fermana xweda digirin dest. Kes li dijî wan dernakeve. Ev mîtolojiyên Sumeran piştre dibin gotinên xweda û di hemû pirtûkên pîroz de tên bicihkirin. Mînak: Çîroka Tûfana Nûh ji aliyê Sumeran ve hatiye gotin. Lê belê, bûye bûyera olî û di pirtûkên pîroz de hatiye bicihkirin. Bi vî awayî, Sumeran civaka xwe ya nû ava kiriye.





Qral-Xweda Tutankamon

**Pirsên nirxandinê:**


1- Çima gund û bajar çêdibin?

2- Rahîban çawa ew qasî bandorên mezin li ser mejiyê mirovan çêkirine?

3- Tu li ser Tûfana Nûh çi dizanî? Binivîse. Tu dikarî ji malbat û derdora xwe bipirsî.

## Di Dema Sumeran de Zayendperestiya Yekem

Di dema Sumeran de bi riya mîtolojiyê bîrdoziya zayendperestî kûr dibe.Tê zanîn berî Sumeran Şoreşa Neolîtîkê hatibû jiyîn. Sumeran li ser hilberînên jinê xwe saz kiribûn. Çandinî, kedîkirina lawiran û avakirina gundan ji wir girtibûn; ji wir fêrî çêkirina alavên xwarinê, aşê genim jî bûbûn. Heya wê demê bandora berdewamkirina jiyanê, ji aliyê jinê ve tê destnîşankirin. Di dema Sumeran de çanda xwedawendiyê lewaz dibe. Di baweriya çanda Şoreşa Neolîtîkê de, bihar demsala pîroz dihat dîtin. Her tim demsala biharê weke pîroziya zêdekirina civakê dihat jiyîn.


Pêşketina Çanda Bavîksalariyê

Merasîmên cur bi cur ên zêdekirina mirovan dihatin pêşwazîkirin. Ev merasîmên salane yên xwedawendan li perestgehan dihatin pêşkêşkirin. Di dema Sumeran de ev merasîmên pîroz ji aliyê xweda-qralan ve weke bindestkirin û kolekirina jinan hatine guhertin. Cara yekem bi navê MUSAKATDÎM malên xerab hatine vekirin. Jin bi hemû berhemên xwe tê desteserkirin û kolekirin. Laşê jinê di van perestgehan de tê bikaranîn. Ev jî, weke fermana xweda tê destnîşankirin.

### Pêşketina Aboriyê



Peyva aborî tê wateya sazûmanî û rêvebirina pêwîstiyên xwetêrkirinê ya klan–qebîleyê. Ji bo roja me ya îro, dikare rêgezên hundirê malê were gotin. Ev sazûmaniya aborî, cara yekem ji aliyê dayîkê ve ji bo berjewendiyên tevahî civakê hatiye pêşxistin. Lê di Sumeran de ev aborî dikeve destên desthilatiyê û ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin. Ev jî dibe sedem ku di nava civakê de newekheviyek pêk bê û çînayetî çêbe.

### Berhemên Sumeran

Gelek vedîtin û berhemên Sumeran ên ku ji dîrokê re hiştine, hene. Ev vedîtin her çi qasî hişmendiya dewletî ava kiribin jî, heya niha tên bikaranîn. Di dema Sumeran de gavên pêşketî ne. Hinek ji wan piştre dibin sedemên dij-mirovahiyê yên mezin. Mînaka sazûmaniya dewletê, yek ji van e.



1- Afirandina nivîsê: 3.200 B.Z
Sumeran nivîsa bizmarî peyda kirine. Ev nivîs bi riya tabletan gihîştiye ta roja me ya îro.
2- Şopandina stêrkan û tevgerên asîman hatine pêşxistin.
3- Ji bo pêwîstî û hesabên rojane, bîrkarî hatiye pêşxistin
4- Sumeran salname pêş xistine.
5- Dewlet û saziyên dewletî ava kirine. Bajarbûn, perestgeh, pîşesazî, navendîkirina bazirganiyê, pêk hatiye.
6- Xwedîtiya (mulkiyeta) taybet di dema Sumeran de berfireh bûye û dewlet jî li ser xwedîtiya taybet ava bûye. Bi taybet, xwedîtî an jî kolekirina mirovan hatiye pêşxistin.
7- Cara yekem pîvanên huqûqî yên nivîskî di dema Sumeran de li ser Ber-Kevir-Zinaran hatine nivîsîn. Ev pîvanên rêveberiya civakê ne. Ev zagonên bi navê Ûrnamû bûne bingehê zagonên din

## Pirsên nirxandinê:

1- Sumeran li ser çi, xwe saz kiribûn?

2- Di dema Sumeran de, merasîmên pîroz ji aliyê xwedaqralan ve çawa hatin guhertin?

3- Berhemên Sumeran ên ku ji dîrokê re hiştine, çi ne?


4- Cudahiya di navbera aboriya dema klan-qebîleyê û dema Sumeran de, beramber bike.

## ŞARISTANIYA EKAD 2.369-2.150 B.Z




Di sala 2.369'î B.Z de hatiye avakirin. Sînorê şaristaniya Ekad ji kendava Besra heya Anatoliyê, ji welatên Îlam heya Derya Spî ye. Ekadî bi xwe ji nijadên Samî ne. Ji ziman û çanda Semîtîk û ya Sumeran bandor bûne.

Bi pêşketina çanda El Ubeyd a Mezopotamya Jêrîn ve bingehê şaristaniya xwe ya navendî ava kirine û şaristaniya Sumeran rûxandine. Artêşa herî mezin a yekem û bazirganiya navnetewî ya yekdestî ava kirine. Di serdemên dîrokê de cara yekem, qralê bi navê Sargon İmparatoriya xwe îlan dike. Şaristaniya Ekad pergala imparatoriya dagirkeriya yekem e. Qral Sargon di dîrokê de yek ji qralên herî bêrehm e.



## ŞARISTANIYA BABIL 2000-550 B.Z

Gelê Babil ji nijada Samî ya çanda Semîtîkan e. Di salên 2.000'î B.Z de ji çolên Erebistanê tên bakurê Sumeran û li nîveka Mezopotamyayê cîwar dibin. Xanedana wan a yekem Babilyona ye. Di 1.950'î B.Z de dema Babil dest pê dike. Di 1.894'an B.Z de xanedana xwe ava dikin. Çand-zimanê wir zêdetir nêzî çand-zimanê Aryen e. Nexşe û rewşa erdnîgariya wê demê, weke Iraqa îro ye.




Şaristaniya Babil

Qralê wan Hamûrabî bi hêz û navdar bû, babilî taybet bi danîna zagonên bi navê wî hatine nasîn. Zagona Hemorabî ya li ser navê gotinên xweda tê binavkirin, di bingeha xwe de zagona qisasê ye. Qisasa ku daniye jî çav bi çav, diran bi diran e.

Di dema Babilê de li şûna hêza olî, hêza artêşê pêş ketiye. Dema qral-xwe-dayan, an jî qral-rahîban bi dawî bûye. Qraltiya bê dawî hatiye avakirin. Piştî têkçûna Xanedana Ûr a 3'yem bi pêşengiya Babilê demeke nû dest pê dike. Zimanê Ekadî dibe zimanê demê yê nû. Weke zimanê bazirganî û ramyarî li tevahiya herêmê bi bandor dibe.



**Pirsên nirxandinê:**

1- Hevokên rast bi (R), yên şaş jî bi (Ş) nîşan bike.

- Ekadî bi xwe, ji nijada Samî ne. ( )

- Qral Sargon mirovekî demokrat bû. ( )
- Di dema Babil de li şûna hêza olî, hêza artêşê pêş ketiye. ( )

2- Ekad, çanda xwe ji kû digirin?


3- Qralê Babilê ê bi nav û deng kî ye? Bi çi tê nasîn?

4- Bi xêzikan têgînên guncaw bigihînin hev.

| | |
|---|---|
| Sargon | Babil |
| Hamûrabî | Ekad |
| Çanda Babilî nêzî | Aryen e |
| Çanda Sumer | Semîtîk e |


## ŞARISTANIYA ASÛR 2.000-612 B.Z

Şaristaniya Asûr ji nijadên Samiyan e. Di 2.000'î B.Z de li Mezopotamyaya jorîn li rexê Dicle-Feratê bi cih bûne. Piranî li bajarê Heleb û Marî bicih bûne. Navenda Asûr Neynewa ye. Li başûrê wan Babilî, li bakurê rojhilat Kasîtî hene. Li aliyê din Mîtaniyan cihê xwe girtine.



Di dema şaristaniya Asûr de arîstokrasiya bazirganiyê zêde dibe. Rêveberiya bazirganiyê û siyasetê di yek destî de tê komkirin û avakirin. Yekdestiya siyasî û bazirganiyê di dema Asûran de pêş dikeve. Ji gelek çandan sûdê digirin. Çanda Sumer, El Ubeyd, Ekad û Babilê dibe bingehekî çandî ji bo wan.

Imparatoriya Asûr ji aliyê zordariyê ve jêmayên Sargon digire dest, zext û zorê li ser gelên herêmê pêk tîne. Ji ber vê zordariyê, ji aliyê gelên herêmê ve konfederesyonek tê avakirin û bi destê konfederesyona Medan di sala 612 B.Z de imparatoriya Asûriyan tê rûxandin.




Imparatoriya Asûriyan

## ŞARISTANIYA MISRÊ


Çemê Nîlê ji başûr Rojhilatê Efrîqayê derdikeve û heya deryaya spî diherike. Ev çem çavkaniya jiyana çanda Misriyan e. Li Bakurê Misrê, Derya spî û li rojhilatê wê jî, Derya Sor cih digirin. Di navbera parzemînên Asya-Ewrûpa-Efrîqayê de cih digire û li ber deryayê ye. Her wiha, çemê Nîlê jî di nav re derbas dibe. Ji hemû berhemên çand-zimanên herêmê sûd wergirtiye.

Şaristaniya Misrê 4.000-3.000 B.Z pêş ketiye. Hin jêmayên xwe, ji çanda xwedawendiyê a dema Neolîtîkê girtiye, hin jêmayên xwe jî ji sumeran girtiye. Sazîbûna hiyarerşiya desthilat navendîtir bûye. Bi qasî 30 xanedanî ava kirine. Bi şêweyên eyaletan hatiye rêvebirin. Bi demê re du qraliyet ava bûne, ya Bakur û ya Başûr, lê qralê Başûr (Mîna) di 3.200 salî B.Z de her du qraliyet kirin yek û serdema xanedaniyan li Misrê dest pê kir. Pêşengên demê yên şaristaniyên din, li Misrê perwerdeyên van zanistan dîtine. Zimanê Misrî yê xweser ê wan bi xwe ye. Zimanê Qiptî bi kar anîne. Heya niha wî zimanî bi kar tînin. Weke kurdiya dema Hûriyan û heya niha. Koledarî di dema Şaristaniya Misrê de pir zêde pêş dikeve. Bi hejmareke pir mezin, mirov hatine kolekirin. Bi taybetî, di çêkirina pîramîdan de bi deh hezaran mirov hatine bikaranîn. Di dîrokê de bi qasî Sumer-Ekad-Babil-Asûran, Misr jî di derketina pergala koledariyê de bi bandor bûye.



Nexşeya Misrê

Di dîroka Misrê de cihê baweriyê pir girîng e. Çanda rewanî ya mirovahiyê, di dema Şaristaniya Misrê de ji bo kolekirina mirovan hatiye bikaranîn. Di dema koledariyê de mirov weke koleyên qral hatine pênasekirin. Mirov koleyên qral û xweda-qralan in (ji qralên misrî yên vê demê re firewn tê gotin, firewn ne navê kesekî bi tenê ye, bi giştî qralên misrê bi navê firewn tên binavkirin, firewn tê wateya mala xwedê). Ew çi bibêjin divê weke wan bikin. Mirov nikarin ji bo xwe bihizirin û tev bigerin. Nikarin azad bijîn. Xweda–qralan ev qedexe kirine. Bi hezarê salan ev sîstema koledariyê li ser mirovan hatiye meşandin û pêşxistin. Êdî mirovan bi vê derewê bawer kiriye. Di dîroka Misrê de li ber çemê Nîlê şaristaniyeke pir mezin tê pêşxistin. Lê belê, hişmendiya xweda-qralan a koledar, nahêle ku her kes wekhev pêş bikeve. Çînayetî li vir jî pêş dikeve. Berhemên civakê yên zêde tên desteserkirin.


Wêne: Civaka Misr

## 2) Li Misrê Çand û Huner

Peykerên herî mezin ên wê demê hatine çêkirin. Ev bi xwe avahîsazî û huneriya demê ye. Her wiha, çêkirina pîramîdên qral-xwedayan ji avahîsazî û hunera hemû deman balkêştir e. Lê belê, ev berhem li ser keda kesên


Pîramîdên Misrê

ku hatine kolekirin, hatine avakirin. Ev jî, metirsiya pergala şaristaniya Misrê ye.

## 3) Li Misrê Zanist

Misr di qada zanistê de gelekî pêşketî ye. Di vedîtina hejmarî, bîrkarî, geometrîkê de gelek tişt bi dest xistine. Di dema Şaristaniya Misrê de avahîsazî, bijîşkî, çandinî, lawirvanî, astronomî û nivîsên cuda hatine pêşxistin. Keştî hatine çêkirin. Hejmarên meh-roj û hefteyan zelal kirine. Salnameya Misrê (ya rojê) ya wê demê, heya niha tê bikaranîn. Ji aliyê Yewnanî û Romanan ve jî, hatiye bikaranîn.



Li Misrê Zanist

**Pirsên nirxandinê:**

1- Bersiva rast hilbijêre.

- Avabûna şaristaniya Asûr li ser peravên

A) Koteberê ye B) Nîlê ye C) Dicle-Feratê ye

- Di dema şaristaniya Asûr de tiştê ku zêde dibe

A) Burokrasî ye B) Arîstokrasî ye C) Demokrasî ye

- Salnameya ku Misriyan bi kar anî

A) Ya rojê bû B) Ya heyvê bû C) Ya zayînî bû

2- Asûriyan sîstema xwe li ser çi ava kirine? Lêkolîn bike.

3- Di dema Xweda-qralan de rewşa mirovên Misrê, çawa bû?

5- Sûdwergirtina ji Çemê Nîlê, diyar bike.

## ŞARISTANIYA ÇÎNÊ

Çîn li başûr rojhilatê parzemîna Asya, welatekî xwediyê xakên pir berfireh e. Ji nîvî zêdetir xaka vî welatî bi taybetî rojavayê Çînê, bi zozanên bilind û çiyayan hatiye dorpêçkirin. Du çemên girîng di nava Çînê re derbas dibin. Huang-ho û Yang-tsî' navê van çeman e.





ŞARISTANIYA ÇÎNÊ



Çîn yek ji şaristaniyên navendî yên herî kevn e. Fosîlên mirovan ên dema paleolîtîk li nêzî paytextê Pekîn hatine dîtin. Di 4.000 sal B.Z de çanda çandiniyê pêş dikeve. Di bingeha çanda çandiniyê de bandorên çanda Aryen diyar in.


Di 3000 B.Z de rêveberiya siyasî ya çînê tê sazkirin. Imparatorî tên avakirin. 22 xanedanan desthilatdarî meşandiye. Di şaristaniya Çînê de gelek berhemên ku hatine dîtin û ji bo mirovahiyê mane, hene. Kaxez cara yekem li Çînê hatiye çêkirin û ximav hatiye bikaranîn. Di heman demê de qalibên çapkirinê hatine peydakirin, toza barûdê hatiye çêkirin, di şahiyan de hatiye bikaranîn.



Yek Ji Mînakên Çapxaneya Yekem

Di aliyê hişmendî de jî çînê ramana Konfiçyos pêş xistiye. Ramana Konfiçyos di bingehê xwe de felsefeya exlaq e. Dema Konfiçyos derketiye çîn di nava şerê deshilatdariyê de ye, ji bo wê xwestiye di çînê de aramiyê ava bike û ramana xwe li ser vî bingehî ava kiriye. ramanên wî heya îro jî li Çîn, Korya, Japonya û derdora wan bi bandor in.

## ŞARISTANIYA HINDISTANÊ




Hindistan li başûrê par-zemîna Asyayê ye. Nîvgiraveke pir mezin e. Li ber okyanûsa Hindê ye. Li Hindistanê bilindtirîn rêzeçiyayên cîhanê (Hîmalaya) hene. Peravên çemê Ganj û Îndûsê xakên herî berhemdar ên Hindistanê ne, ji ber vê yekê pîroz hatine dîtin.

Şaristaniya Hindistanê di 3000 salî B.Z de li peravên Îndûsê pêş ketiye. Weke mêtingeheke Sumeran bi carekê re di nava dîrokê de xuya kiriye. Du navendên girîng ên şaristaniya Îndûsê hene.

**1-Mohenjadaro**

**2-Harappa**



Ji bermahiyên Îndûs û Mohenjadaroyê tê têgihîştin ku ji çanda Neolîtîk a Mezopotamyayê gelek bandor bûne. Çanda Ganjê ya nûvejînê gelek cuda ye. Baweriya xwe bi avê tînin. Ji ber vê baweriyê, serdana vî çemî û şûştina di




ava wî de dibû weke heceke olî, bi vê baweriyê fêr dibûn ku ji hemû kêmasî û gunehên xwe paqij dibin. Dema jiyana xwe ji dest didan, termên xwe dişewitandin û xweliya mayî li ser rûyê avê belav dikirin.

Di aliyê hişmendî de ramana bûdîzmê li hindistanê pêş ketiye. Dema bûda derketiye li hindistanê brahmanîzm serwer e. Di hişmendiya brahma de qast hene. Bûda ji nav brahmayiyan derdikeve û li dijî wan hişmendiyeke nû pêş dixe. Hişmendiya bûda li ser bingehê felsefeya exlaq (zanabûn, fikirandin, li ser nefsa xwe hukmkirin, ji xirsên mirovî dûrketin, li ser van bingehan xwe gihandina rastiyê) pêş dikeve.

Ramana Bûda heya îro jî hatiye û li herêma Hindistan, Çîn, Japonya, Rûsya, Emerîka û hwd. bi bandor e.

## Encama deshilatdariya koledar ya serdema yekemîn

Di encamê de şaristaniyên navendî ji bo çand-zimanê xwe ava bikin û xwe birêxistin bikin, hem bi civakê re û hem jî bi hev re gelek şer û pevçûn kirine. Pir zêde xwîn hatiye rijandin. Mirovahî hatiye kolekirin. Gelek komên etnîk ji bo parastina xwe di nava berxwedaniyên mezin de mane. Li şûna çanda dayîka xwedawend a Şoreşa Neolîtîkê ku bi aramî, dewlemendî, hevsengiya mirovan hatibû derbaskirin, dema baviksalariyê ya pir giran û zehmet hatiye rûniştandin.






Çend dîmenên ku encama şaristaniyê ne

### Pirsên nirxandinê:

1- Berhemên şaristaniya Çînê, binivîse.

2- Hindosan bi çi bawer kirine û çawa baweriya xwe pêk anîne?

3- Şaristaniyên navendî, çi encam bi xwe re anîne?

4- Kîjan destkeftiyên dema Dayîka Xwedawend, di dema baviksalariyê de hatine windakirin?

## PIRSÊN NIRXANDINA BEŞÊ

1- Cudahiya di navbera çanda El Ubeyd û çanda Tilhelefê de çi ye? Zelal bike.

2- Sumeran di koloniyên xwe de, bazirganiya çi kirine? Bi nav bike.

3- Sazûmaniya rahîb yan jî şaman, bîrdozî ye, yan na, çima?

4- Navê şaristaniyên navendî yên Rojhilata Navîn, binivîse.

5- Mîtolojiyên civaka xwezayî, piştre di nava kîjan pirtûkan de hatine nivîsîn?

6- Ji derveyî avakirina dewletan û sazûmaniya xweda-qralan, civak dikarin xwe bi rê ve bibin, an na? Nêrînên xwe bide xuyakirin.

7- Harappa û Mohenjadaro li ber kîjan avê ne? Navê wê binivîse. Kîjan şaristaniya navendî li ber vê avê pêş dikeve?

8- Taybetmendiyên şaristaniya Misrê, binivîse.

# BEŞA 4

## LI MEZOPOTAMYAYÊ, LI DIJÎ ŞARISTANIYA NAVENDÎ, DÎROKA BERXWEDANA ETNÎSÎTEYAN

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1) Tu şaristaniyê çawa dibînî?

2) Çanda gelê kurd, ji kîjan dîrokê dest pê dike?

3) Şaristaniya navendî di roja me ya îro de, di kîjan qonaxê de ye?

4) Bandora pêxemberan a li ser civakan, şîrove bike?

5) Çi zanîn û agahiyên te li ser Aryenan hene?

6) Dîroka Gûtiyan, lêkolîn bike.

7) Urartuyî li kîjan herêmê jiyane û taybetmendiyên wan, çi ne?

## LI MEZOPOTAMYAYÊ LI DIJÎ ŞARISTANIYA NAVENDÎ DÎROKA BERXWEDANA ETNÎSÎTEYAN

### A) BERXWEDANA GELÊ ARYEN

Di navbera 12.000 û 6.000 salî B.Z de li gelî û deştên di nava çiyayên Toros û Zagrosê de komên mirovan ên bi navê Aryen dijiyan. Ev kom, li Kevana Berhemdar komên afirîner ên çanda Neolîtîkê ne. Ev jî, di lêkolînên peyvnasî (etîmolojî) û şûnwarnasiyê (arkeolojî) de derketiye holê.

Ev gelê herêmê, ji ber ku di çanda çandiniyê de gav bi gav pêş dikeve, mirov jê re bêje **çanda zevîkariyê** wê rastir be. Her wiha, di dîrokê de ev komên ku bi navê "Aryen" tên nasîn, bi navê **yên xwedî zevî**, **xwedî erd** jî, tên binavkirin. Peyva Arî di kurdî de tê wateya "erd û zevî".




**Pênasekirina Peyva Kurd û Kurdistanê**

Di tabletên nivîskî yên ji pêvajoya Sumer, Ekad, Babil, Asûr û Hîtîtan mayîn de ji bo civaka kurd navên cur bi cur hatine bikaranîn. Gûtî, Kirtî, Kurtî, Kardaka û Kardoxî... hinek ji van navan in. Piraniya van civakan bi armanca pesindayînê ev nav bi kar anîne.



Bi van navên bi kar tanîn, xwestine hêzbûn, cengawerî û xweragiriya civakê bînin ziman. Di bingeha navê Kurdistanê de peyva "kur" cih digire.

Di zimanê Sumeran de "kur" di wateya çiya de tê bikaranîn. Pêveka "tî" girêdanê diyar dike. Bi vî awayî, peyva



Kurdên Li Gundan Dijîn

"kurtî" tê wateya gelên çiya. Her wiha, civaka Lûlûyî yek ji civakên aryenîk bû û ji bo civaka kurd, peyva; "Gundwan" bi kar anîne.

Ev jî, di wateya "welatê gundan" de hatiye bikaranîn. Asûriyan jî navê "Naîrî" bi kar anîne, ango "gelê ro-baran". Di belgeyên di derbarê bav û kalên kurdan ên ku heya niha hatine bidestxistin de, di ronîkirina dîroka gelê kurd de ne bes in û kêm in. Bi lêkolîn û lêgerînên arkeolojiyê yên ku bên kirin re, wê dîroka gelê kurd baştir were zelalkirin.







Amediyê




Çiyayê Nemrût

Hin Dîmenên Kurdistanê

## 1) HÛRÎ

Pêşiyên kurdan di dîrokê de cara destpêkê bi navê Hûrî, 3000 salî B.Z ji aliyê sumera ve hatine binavkirin. Hûrî, xwediyê şaristaniyeke mezin bûn.




Şaristaniya Hûrî

Civakên li derdorê, di aliyê şaristaniyê de ji wan bandor bûne. Ji vî alî ve, bi taybetî Hîtîtan ji wan gelekî sûd wergirtine. Hûriyan di derbaskirina şaristaniya Sumer a ji bo welatên Hîtît, Lûlû, Îyon û Persan de roleke weke ya pirê lîstine. Navê qralê Hûriyan ê destpêkê Arîşan bû. Ji êlên Arî ne, di zimanê sumeran de Hur ji bo erdnîgariyên bilind tê gotin. Lewma erdnîgariya çiyayî ya Mezopotamya Jorîn bi navê Hûrî hatiye nasîn. Navendên wan yên sereke: Herêmên îro yên mîna: Riha, Mêrdîn, Amed, Kerkûk, Tilberak, Tilfexriyê, Çaxir Bazar, Orkêş ... Li gorî lêkolînan B.Z di salên 6000'an de derketine holê, lê di belgeyên dîrokî de B.Z ji 3000'an û şûnde behsa wan tê kirin.




li gorî hin şîroveyan yên ku çanda Tilhelef avakirî gelê hûrî ye. ji ber çanda çandiniyê bandoreke gelek xurt li ser herêmê dikin. Zimanê Hûriyan ji bo êlên arî


zimanekî resen e, li gorî lêkolînan zimanê kurdî jî koka xwe ji zimanê Hûriyan ê resen digire.

Di sala 1500 B.Z û şûn de li heman erdnîgariyê mîtanî weke berdewamiya çanda hûriyan derketin.

**Pirsên nirxandinê:**

1- Mirovên bi navê Aryen li kû jiyane, gelê wê herêmê bi kîjan çandê dihat nasîn?
2- Ji hêla gelên derdorê ve,kîjan nav li kurdan hatine kirin, ev nav ji bo çi hatine bikaranîn?
3- Tu jî ji malbata xwe bipirse ka kurd di dîrokê de bi kîjan navan hatine nasîn? Li ser lênûsa xwe binivîse.
4- Hûrî kî ne, li kû jiyane û li ser kîjan gelên derdorê bandor kirine?

## 2) ÎLAM




Îlam, li başûr rojavayê Îranê weke welatekî kevn û şaristaniyeke dîrokî ye. Di serdemên dîrokê yên borî de, Îlamî di aliyê çandî de bi Mezopotamya re di têkiliyeke baş de ne, piştî vê bi bandoriya desthilatiya Ekadiyan, fêrî nivîsa bizmarî ya Sumer-Ekad dibin. Bi demê re dikevin bin desthilatiya Gûtiyan û piştre jî dikevin bin desthilatiya xanedaniya Bajarê Ûr ê sêyemîn. Wisa tê zanîn ku nêzî sala 1.600 B.Z Kasîtiyên ku Mezopotamyayê dagir dikin, her wiha dawî li şaristaniya Îlam jî tînin. Piştî sedsala 13. B.Z Îlamiyên ku dîsa bi hêz dibin, di dema qralên xwe Îutnuk Nahunte û Kutir Nahunte de, Mezopotamyayê dagir dikin û gelek berhemên dîrokî bi dest dixin. Di dema herî bi bandor a Îlamiyan de, Neboxetnesirê Babilî, bi destxistina "Sûs"ê (paytexta Îlam) dawî li desthilatiya Îlamiyan tîne. Îlam sala 640 B.Z dikeve bin desthilatiya qralê Asûr Asûrbanîpal. Îlamiyên ku dikevin rewşa eyaleteke İmparatoriya Persan, ji vê dîrokê û şûn de em zêde rastî navê wan nayên. Bajarê Îlamê yê ku Îrana îro ye, navê xwe ji Îlamê digire.

## 3) GÛTÎ

Şervanekî Gûtiyan



Di zimanê Sumeran de tê wateya gelê xwedî ga, cara yekem navê Gûtiyan di belgeyên Akadan de hatiye dîtin. Gûtî di navbera çiyayên zagrosê û Ava Zê de jiyane, navendên wam ên sereke ev in: Ganj Dara (Kirmanşah), Ûrbîlum (Hewlêr) û Harkar (Hekarî). Di salên 2700'î B.Z de derdikevin pêş û di xakên bi berhem ên Mezopotamyayê de bi cih dibin. ji salên 2500'î û şûnde di nav êlên Arî de hevgirtinek çêkirine û konfedrasyona êlan bi armanca xweparastinê ava kirine. Li beramberî êrîşên sumer û akad li ber xwe dane. Dema bihêz bûne jî êrîşî Akadan kirine û imperatorya Akad hilweşandine.




Gûtî jî di warê çand û ziman de berdewamiya Hûriyan in. Pêşiyên Med û soranên îro ne. Di hunerên destan de pêşketî ne, seramîkên bi wêneyan xemilandî çêkirine, her wiha ji sifir, zêr û zîv jî gelek amûrên xemilandinê çêkirine. Gûtî bi rengê konfedrasyon xwe bi rêxistin dikin, êlên Lûlû, Îlam, Kîmaş, Erdêla ji wan qut dibin, qutbûna wan dibe sedema lewaziya Gûtiyan. Di vê qelsbûnê de xanedana Ûr êrîşî wan dikin û di sala 2120'an de wan têk dibin, gûtî û êlên din dîsa xelasbûnê di çiyan de dibînin û berê xwe didin çiyayên Zagrosê.

## Pirsên nirxandinê:

1- Îlamî di dema kîjan qralên xwe de bi hêz dibin û çi dikin?

2- Bersiva rast hilbijêre

-Çanda Îlamiyan çanda
A) Semîtîkan e B) Aryenan e C) Sumeran e

-Paytexta Îlamê
A) Neynewa ye B) Ekad e C) Sûs e

3- Gûtî, di zimanê Sumeran de tê çi wateyê?

4- Gûtiyan, desthilatdariya xwe çawa meşandine?

## 4) LÛLÛYÎ

Di dirokê de di derbarê Lûlûyan de zanîn û agahiyeke berfireh û zelal tuneye. Tê zanîn ku ji kokên Aryenan in. Di navbera salên 2.800-1.400 B.Z de li ser dika dîrokê cih girtine. Li gorî bermahiyên arkeolojîk, şaristaniya Lûlûyî zêdetir li Anatolya navîn û nêzî bajarê Edene û Hatayê hatiye jiyîn.



Xwedawend Lolo, Qral Pîroz Dike



Dîmeneke Lûlûyan

Di derbarê Lûlûyan de agahiyên misoger di arşîvên dewleta Hîtît û di belgeyên bazirganî yên Asûr û Yewnan de tên dîtin. Zimanê wan ji koma Aryen e. Di van belgeyan de diyar dibe ku Lûlûyî bi gelê Aryen re di nava têkiliyên mezin de bûn. Bi taybetî, bandora wan di aliyê ol, ziman û çandê de li ser civakên din ên Anatolyayê mezin in. Li Anatolyayê pêvajoyeke pir dirêj zimanê Lûlûyan serwer bûye. Navê xweda û xwedawendên weke: Kibele, Artemîs, Apollon, Afrodît û hwd. Lûlûyî ne.

## 5) KASÎT



Di dîrokê de bi navê Kasît, an jî Kasayî hatine nasîn. Di zimanê Sumeran de Kasît, tê wateya ‘gelê hejar’. Ew, civakeke çiyayê Zagrosê bûn. Pêşiyên lor yên Rojhilatê Kurdistanê ne. Cara destpêkê li herêma Kirmanşahê hatine dîtin. Dîroka hatina wan a vê herêmê ne zelal e. Lê weke hemû civakên Zagrosê, niştecihên herêmê yên resen in. Ekadiyan ew weke "Kaseşî" bi nav kirine. Di pêvajoya qralê dawî yê Babilê de ku jê re Samûrdîtana dihat gotin, Hîtîtî, Mîtanî û Kasît yekîtiyekê çêdikin û êrîşî Babilê dikin û di sala 1.596 B.Z de dawî li desthilatiya Babilê tînin. Li gorî belgeyên dîrokî, piştî ev welat ji aliyê Hîtîtan ve tê talan û wêran kirin, vedigerin welatê xwe yê li Rojavayê Feratê. Piştî vê bûyerê, li Babilê sazûmaniyeke din ji aliyê hemwelatiyên Babilê ve dadimezirînin. Ev sazûmanî, cardin rastî êrîşên Kasîtan tê.

Navê qralê Kasîtan ê wê demê "Xandîş" bû. Di dema vî qralî de Kasîtî welatê Sumer ji destê qralê wan ê dawî bi navê "Ea Gamîl" derdixin, bi vî awayî welatê Ekad û Sumer bi navê "Kardunyas" digihînin hev. Ji vir û pê de ev sazûmanî bi vî navî tê nasîn. Li Babilê desthilatdariya Kasîtan nêzî 400 salî berdewam kiriye.

Di sala 1207 B.Z de di encama serhildaneke ku ji aliyê civakên Samiyan ve tê lidarxistin de, dawî li vê desthilatdariyê tê.

Gelê Kasît di dîrokê de hebûna xwe berdewam dike. Dema îskender (B.Z 330) êrîşî Kurdistan û Îranê dike, li herêma zagrosê bi berxwedaniya Kasîtan re rû bi rû dimîne. Dîroknasên helenî vê rewşê dinivîsin.

**Pirsên nirxandinê:**


1- hevokên rast bi (R), yên şaş bi (Ş) nîşan bike.

- Bandora Lûlûyan di aliyê ol, ziman û çandê de li ser civakên din mezin bû**.** ( )
- Di zimanê Sumeran de Kasît, tê wateya gelê dewlemend. ( )
- Ekadiyan, Kasîtî weke "Kaseşî" bi nav kirine. ( )

2- Rola Kasîtan a di pêvajoya Qral Xandîş de, binirxîne.

3- Şaristaniya Kasîtan, bi destê kê bi dawî dibe?

## 6) MÎTANÎ




Şaristaniya Mîtanî

konfedresyona Mîtanî di destpêka 1.500 B.Z de ji aliyê çengekî Hûriyan ve li bakurê rojavayê Kurdistanê tê damezirandin.

Di belgeyên Hîtîtan de Mîtanî bi navê Xanîgalbat hatine binavkirin. konfedresyona Mîtanî, ji bajarê Kerkemîş ê li peravên çemê Feratê dest pê dikir, Xabûr û Êlih dorpêç dikir heya Nisêbînê, li rojhilat bajarê Bedlîs e, li bakur Xerpût û Meletî ne, li aliyê başûr jî bajarê Heleb û Kerkûkê (Nûzî) digirt nava xwe. Li bakur û rojava Hîtît e, li başûr Asûrî û li rojhilatê wan jî qebîleyên Hûrî cih digirin. Paytexta konfedresyona Mîtaniyan, li deşta Rihayê bajarekî bi navê "Waşûkanî" (Serê Kaniyê) bû.



Hinek Bermahiyên Şaristaniya Mîtanî

Komikên Hûriyan ên ku bi awayekî serbixwe jiyana xwe didomandin, li hemberî êrîşên civakên biyanî gelek caran dibûn yek û bi awayê konfederasyon, jiyana xwe berdewam dikirin. Ji derveyî damezirandina konfederasyonê, bi riya panteonan (perestgeha xwedayan) jî, rêveberiya navendî damezirandine.

Di derbarê vê rêvebertiya ku bi qasî 250 salî berdewam kiriye de, belgeyên nîvîskî gelek in. Ev belge, bi zimanê Hûrî hatine nivîsîn, wekî din di belgeyên nivîskî yên Hîtît, Misr û Asûran

de jî navê wan cihekî mezin girtiye. Di belgeyên dîrokî de navê 14 qralên ji yek xanedanê hatine vedîtin. Qral Kîrta, di salên 1.500-1.490 B.Z de weke damezirînerê rêveberiya Mîtaniyan cih digire.

Mîtanî, xwediyê şaristaniyeke di asta jor û pêşketî de bûn. Bandora wan a li ser Hîtît, Misr û Asûran di belgeyên nîvîskî de derbas dibe. Bi armanca siyasetê, di navbera Mîtanî û Misriyan de zewac çêbûne. Qralîçeya Misrê ya navdar Nefertîtî jî, ji Mîtaniyan bû, heman peywendî bi Hîtîtan re jî hatibûn sazkirin.

### 7) NAÎRÎ

Di derbarê vê civakê û rola wê ya dîrokî de belgeyên ji Asûriyan mane, agahiyan didin me. Li gorî vê, di sala 1.200 B.Z de Asûran di wateya welatê "av", an jî "robaran" de peyva "Naîrî" ji bo wan bi kar anîne. Weke berdewama Hûriyan tên pejirandin. Piştî ku rêvebertiya Mîtanî tê rûxandin, ev civak girîngiyê qezenc dike. Weke desthilatiyeke mezin nebe jî, weke konfederasyon ango hêzeke ji desthilatiyên biçûk pêk hatiye, di dîrokê de cih girtiye.

Ji belgeyên ku ji demên kevn mane, em têdigihin ku welatê Naîrî ji çavkaniya Dicle û Feratê dest pê dike û bajarên Amed, Xerpût, Dêrsim, çiya û herêmên Bedlîs û heya deverên derdora Zagrosê dirêj dibe.

Di sala 910 B.Z de leşkerên Asûran êrîş birine ser welatê Kûtmaxê yê di navbera Dicle û Cûdî de cih digire û bi wan re şer kirine.

Civaka Naîrî demeke pir dirêj li hemberî hêza herî mezin a cîhana wê demê Asûran li ber xwe daye û welatê xwe parastiye. Lê, di encama êrîşên Asûran ên li ser Naîriyan de di sala 900 B.Z de dawî li desthilatiya Naîriyan tê.

## Pirsên nirxandinê:

1- Firehbûna xaka Mîtaniyan, ji her çar aliyan ve zelal bike.

2- Navê paytexta Mîtaniyan çi ye? Li ser nexşeyê cihê wê diyar bike.

3- Koka Mîtaniyan çi ye û bi çi awayî xwe diparastin?

4- Kê navê Naîrî li vî gelî kiriye û tê çi wateyê?

5- Cihên vala bi peyvên gunaw dagire.
Ji belgeyên demên kevn mane, em têdigihin ku welatê Naîrî ji çavkaniya ……… û ………… dest pê dike û bajarên …………., Xerpût, ………….., çiya û herêmên …………û heya deverên derdora Zagrosê dirêj dibe.

## 8) URARTU

Di zimanê Sumeran de Ûr tê wateya gir an jî, cihê bilind. Urartu jî, tê wateya civaka welatên bilind e. Dema ku desthilatdariya Naîriyan lewaz dibe, di salên 900 B.Z de li welêt, hêzeke din a bi navê Urartu derdikeve qada dîrokê. Urartuyî berdewama Naîriyan in, zimanê wan zimanê Hûriyan e. Urartu hem weke welateke çiyayî hem jî bi navê xwedayê xwe Xaldî dihat nasîn.

Bi têkçûna desthilatdariya Naîriyan re li herêmê begtiyên biçûk û serbixwe derdikevin holê. Ev begtiyên biçûk ên ku di bingehê xwe de digihîjin Hûriyan, bi civakên cihêreng ên ku di demên cur bi cur de hatine herêmê û niştecih bûne re, tevlîhev dibin û bi demê re civaka bi navê Urartu pêk tînin.




Şaristaniya Urartu

Her çi qas sînorê welatê Urartu carinan hatibe guhertin jî, ji çavkaniya çemê Feratê heya zozanên Ermenistanê, ji Zagrosê heya Torosê fireh bû. Desthilatiya Urartu di salên 875 B.Z de ji aliyê qral Sardûr ve hatiye damezirandin. Paytexta Urartuyan Tûşpa (Wan) bû. Qral Sardûr ta ku xwe ji êrîşên Asûran biparêze, Kelha Wanê ya ku di roja me ya îro de jî dimîne, ava dike. Li ser birceke kelehê ku bi navê wî tê nasîn, bi nivîsa bizmarî nivîsek kolaye. Di nivîsê de qral Sardûr xwe weke qralê Urartu yê mezin daye nasîn.

Bernameya xwe ya siyasî rave kiriye û diyar kiriye ku desthilatdariya Asûran napejirîne.

Di erdnîgariya Mezopotamya jorîn de riyên bazirganiyê di navbera Rojhilat û Rojava de vekirine heya roja îro jî hinek ji van riyan tên bikaranîn. Urartu bi taybet di mijara cokên avdaniyê de gelek pêşketî ne, bi dezgehên xwe yên avdaniyê berhemên xaka xwe zêde kirine. Her wiha di lawirvanî û bikaranîna kanzayan de jî pêşketî ne.

Urartu şaristaniyeke ku li ser bingehê çand û berxwedanê hatiye avakirin. Nêzî sêsed sal li hember êrîşên Îskît û Asûran li ber xwe daye û li ser piyan maye. Ji aliyê çandî, pîşesazî, çêkirina amûrên şer, çêkirina zîv û zêr, mîmarî, çandinî û lawirvaniyê ve pêş ketine.

Kareketerê ku şaristaniya Urartu xwe li ser ava kirî ji karekterê dewletên navedî yên serdema wan cudatir bû. Gelê ermen û gelê kurd di nava vê şaristaniyê de gelê herî girîng bûn. Gelê ermen zêdetir bi pîşesazî, bazirganî û çêkirina zîv û zêr ve mijûl dibû. Gelê kurd jî zêdetir bi çandinî û lawirvaniyê ve mijûl dibû.

Urartu di sala 606 B.Z de, ji aliyê konfedresyona Medan ve tê rûxandin.

## 9) HÎTÎT




Di derbarê koka wan de tu agahiyên zelal tunene. Tê zanîn ku di nava wan de gelên weke: lovî, hûrî, xaldî û hatûşî hene. Ev her çar komên etnîkî xwediyê çand û zimanê Aryen in. Civaka Hîtît, şaristaniyeke di Asya biçûk de 1.900-1.200 salî B.Z derdikevin qada dîrokê û desthilatiya herêmê dixin destê xwe û weke modêla birêvebirinê jî, modêla rêveberiya Sumeran bingeh digirin. Bi qasî ku navendeke bazirganiyê bû; ew qas jî li herêmê xwediyê

çavkaniyên kanzayan bûn, ku ji bo wan dibû avantajeke mezin.


Şêweyê rêveberiya leskerî

Beramberiya Babil, Asûr û Misriyan dikir. Di sala 1.595 B.Z de Babilê dagir dikin û di sala 1.243 B.Z de jî, bi Misriyan re peymana KADEŞ'ê muhr dikin. Xwediyê çêkereke konfederasyona eşîran bûn û piştre, bi demê re guherî çêkereke koledar. Di şaristanîbûna Anatoliyê de kedeke mezin a Hîtîtan heye. Ji ber pêwîstiyên kanzayî, Hîtît bi Babil, Misr, konfederasyona Mîtanî, Helen û Îyon, berdewamî di rewşa şer de bûn. Bi taybetî komên etnîkî yên ji koka Ermeniyan kanzayên hesin û sifir bi kar anîne û ji şaristaniyê re bûne alîkarên herî mezin. hêzeke wan a xwedayî hebû ku ji mîtolojiya Sumer û komên etnîk ên Aryen hatibû, xwe dispart xwedatiya sê-alî ya esman, erd û axê. Çêkera mîtolojî ya wan a kevn ku xwe dispart pirxwedayan, hêdî hêdî kêm bû. Bi hatina Qraliyeta navendî di Sumeran de û peymana sê-alî ya çêkerê hate rûniştandin. Lê hîna negihîştibûn ola yekxwedayî, şerên xwedayan wê gelekî bidomin. Di peymanê de hebûna xwedawendan hîna bihêz e, lê yekane, ji zû ve winda kiriye û her ku diçe girîngiya xwe winda dike. Ji vê re çanda xwedawend a KIBELA jî, tê gotin.

## Pirsên nirxandinê:

1- Bersiva rast hilbijêre.

- Urartu, tê wateya welatê cihê
  A) Bê av B) Bilind C) Nizm
- Urartu bi têkçûna
  A) Medan B) Sumeran C) Naîriyan re der-dikeve.
- Hîtît, bi Misriyan re peymanekê li dar dixin ew jî peymana
  A) Kadeşê ye B) Helebê ye C) Wanê ye

2- Rola Qral Sardûr di Urartu de çawa bû? Şîrove bike.

3- Hîtîtan, çi modêla birêvebirinê bi kar anîne û beramberiya kê kirine?

4- Hîtîtan çi kanza bi kar anîne?


## DI NAVA VAN CIVAKAN DE RÊVEBERTÎ

Taybetiyên hevbeş ên rêveberiyên ku ji aliyê eşîrên kurdan ve hatine damezirandin destpêkê weke rêveberiyên bajar an jî herêman, xwe birêxistin kirin e. Ev bajar û rêveberî piştî demekê, bi taybetî jî li hemberî metirsiyeke mezin a ji derve, li derdora konfedresyonekê kom dibin û weke yekrêveberiyê, tev digerin.

Bajarên ku ji aliyê mîrekan ve hatine birêvebirin, girêdayî qralê vê rêveberiyê, kar dikirin. Hemû pêdiviyên rêveberiya jor, ji aliyê van mîrekan ve dihatin pêkanîn. Di



karên rêveberiyê de sê wezîran alîkariya qral dikirin. Ev wezîr, bi navê Şahîn Matî, Sûkallû û Halzûhlû, dihatin binavkirin. Di bajarên Hûriyan de rêveberiya herêmî ya ku ji şaredar û meclisa şarederiyan pêk hatî jî, hebûn. Piştî rêvebiriya Mîtanî hat damezirandin, qraliyetên bajaran dikevin rewşeke xweser. Karên rêveberiyê ji aliyê kesên diyar, ên nêzîkî malbata qral ve, tên birêvebirin. Di rêveberiyên xweser de mîrek, desteya rihspiyan û kesekî ku ji aliyê Mîtaniyan ve hatî hilbijartin cih digirin. Lê dema rêveberiya Mîtanî li hemberî êrîşên Hîtît û Asûran her ku diçe lawaz dibe, desteya rihspiyan a van rêveberiyên bajaran jî, girîngiya xwe winda dike.



Şêweyê rêveberiyê

Li welatê Hûrî û Mîtaniyan ji derveyî rêveberiyên bajarî, herêmên girêdayî kesan û rêveberiya wan jî hebû. Dema

rêveberên herêman amade nebûna, ev herêmên mijara gotinê, ji aliyê desteya rihspiyan ve dihatin birêvebirin. Lê tevahî bajarên girêdayî Hûriyan, demên destpêkê ne ku ji aliyê mîrek û kesên berbiçav ên van bajaran ve dihatin birêvebirin.

Di Hûriyan de rêveberî bi taybetî piştî rûxandina Mîtaniyan vedigere rêveberiyeke konfederasyonê, ku ji aliyê eşîrên serbixwe ve dihat pêkanîn. Piştî demekê, ev eşîrên serbixwe weke konfederasyonên Naîrî û Urartu derdikevin holê. Beriya wan, li Zagrosê konfederasyonên Lûlûyî, Gûtî û piştî demeke din jî, konfederasyona Medya ji aliyê van eşîrên serbixwe ve tê damezirandin.

## DI NAVA VAN GELAN DE OL



Di civakên pêşiyên kurdan de, yên ku beriya niha navê wan derbas bûbû, weke civakên hevdemên wê çaxê baweriyeke pirxwedayî hebû, lê xwedayê Hûrî û Mîtaniyan hebû, ku di ser hemûyan re û yê herî mezin bû, bi navê Teşûb dihat binavkirin. Lê wan bawerî bi xwedayên civakên cîran jî, tanîn. Navê xwedayên pêşiyên kurdan, bi yên Hindiyan re wekheviyek nîşan dida. Di belgeyên dîrokî yên ji Hûriyan mane de nêzî 80 navê xweda û xwedawendan hatine eşkerekirin. Di nava wan de li gel xweda û xwedawendên biyanî, xweda û xwedawendên ku nûnertiya bûyerên xwezayî dikirin jî, hene. Girîngiyeke mezin dane bûyer û heyînên xwezayî. Heya ew ji xwe re weke xweda jî, pejirandine. "Xwedayê welat û xakê Ebanî, xwedawenda xweşikbûnê



Şawişka

Şawişka, xwedaya derya û robaran Sûînîna, xwedayê çiya û giran Arnî…" çendek ji wan bûn.
Xwedayê herî mezin ê Urartuyan, Xaldî bû. Di demên çûna cengan de ji bo xweda Xaldî, gorî dihatin dayîn. Wisa hizir dikirin ku xweda Xaldî dema ku desthilatiya Urartu hatî damezirandin, xwedayê eşîra herî mezin a vê rêveberiyê bû. Avahî û qesrên çêdikirin, li ser navê Xaldî hatine çêkirin. Navê hevjîna wî, Arûbanî bû. Lê weke xwedawendekê rêz nedidît.



Ji aliyê Urartuyan ve, dûrik û nimêjên olî gelek dihatin pêkanîn. Wê ji bo kîjan xwedayî, çawa û çi qas gorî bihatana dayîn, di nivîsên wan de hatibûn destnîşankirin. Wekî din, di demên hişkayiyan de, di xela û cengan de jî, gorî dihatin dayîn. Di baweriya Hûrî û Urartuyan de perestgehan jî, cihekî girîng digirt. Ûrartûyan ji bo tirba qralên xwe, tehtên asê dikolan û ew tê de vedişartin.

### Pirsên nirxandinê:

1- Taybetiyên hevbeş ên rêveberiyê, çi bûn?

2- Di karên rêveberiyê de, kê alîkariya qral dikir û navê wan çi bû?

3- Rêveberiya bi rengê konfederasyonê, bi kê re derdikeve?

## PIRSÊN NIRXANDINA BEŞÊ

1. Navê hinek şaristaniyên Mezopotamyaya Jor, binivîse.
2. Navê herêmên ku Hûrî, Gûtî û Mîtanî lê jiyane, bêje.
3. Şaristaniya Îlam, li kîjan herêman pêş ketiye?
4. Gûtî kî ne?
5. Navenda Urartuyan li kîjan herêmê bû?
6. Di van şaristaniyan de, rêveberî bi çi şêweyî bû?
7. Hûrî kî ne?
8. Hîtîtan bi hemû aliyên wan ve, şîrove bike.
9. Di Urartu û Mîtaniyan de, ol bi çi awayî bû?
10. Pêşketina olê, bi çi awayî pêk hat?

# BEŞA 5

## DÎROKA MEDAN

### PIRSÊN AMADEKARIYÊ

1. Çawa konfedrasyon di nava eşîrên kurdan de pêş dikevin? Lêkolîn bike.
2. Çawa eşîrên kurdan li hemberî êrîşên ji derve, xwe parastine? Lêkolîn bike.
3. Li ser çêkera eşîran, çend cureyên êrîşan tên meşandin? Lêkolîn bike.
4. Civakên Medan li kû bi cih bûne, jiyana xwe çawa didomandin? Lêkolîn bike.
5. Imparatoriya Asûran li ser civakên Medan stemkariyeke çawa meşandiye? Li hemberî vê stemkariyê, civakên Medan kîjan rê ji xwe re hilbijartine? Lêkolîn bike.
6. Di dema konfedaresyona Medan de, Keyakser çi pêşketin çêkir? Lêkolîn bike.

## DI EŞÎRBÛYÎNA KURDAN DE TÊKILÎ, RÊVEBERTÎ Û RÊXISTINBÛYÎNA EŞÎRTÎ



Zozanên Kurdistanê

Erdnîgariya ku Gelê kurd li ser jiyaye û dijî di pir qonaxên dîrokî re derbas bûye. Jiyana kurdan a civakî jî, li gorî van qonaxên dîrokî şêwe girtiye. Ax, hewa, çand û dewlemendiya xakên Kurdistanê bi taybetî cihgirtina erdnîgariya Kurdistanê di navbera çemên Dicle û Feratê de, girîngiya wê zêdetir kir. Di heman demê de Kurdistan di erdnîgariya Rojhilata Navîn de cihekî stratejîk digire. Ev jî dibe sedem, ku Kurdistan bibe qadeke şer û pevçûnan. Li hemberî van êrîşan, kurdan li çiya û zozanên Kurdistanê bi şêweyê klan, qebîle û eşîran xwe bi rêxistin kirine û li hemberî hemû êrîşên ji derve xwe parastine.



Pir caran eşîrên kurdan belav bûne, ji bo xwe biparêzin, li cihên herî bilind û asê diman. Ji bo bikarin azad li ser axa xwe bijîn, eşîrên nêzî hev xwe bi rêxistin kirine. Ev rêxistin, di-

gihaşt rêxistinbûyîneke konfederal. Beriya ku di nava eşîran de gelbûyîn û çînayetî pêş bikeve, eşîrên heyî ji bo bikarin xwe biparêzin di nava xwe de digihêjin hinek lihevhatinan. Li ser bingehê van lihevhatin û peymanan jî, sazûmaniyeke konfederasyona eşîran pêk tînin. Di nava vê sazûmaniyê de rêgeza sereke **wekhevî** ye. Di nava eşîran de erkparvekirin, li gorî van erkan tevgerîn, bingeh tê girtin. Di nava pergala konfederasyona eşîran de gelek kar bi hev re tên meşandin. Li hember êrîşên ji derve, eşîr her tim bi hev re dikevin nava parastinê. Li ser van hîman peyman tên muhrkirin û dikevin pratîkê.

Di nava eşîrên serbixwe yên koçber û niştecih de jî, ev parastin tê berdewamkirin. Li hemberî êrîşên ji derve, bi tena xwe şerkirin zehmet e.

Pergala eşîran ji bo xweparastinê her tim pêdivî bi hev û du dîtiye. Ev pêwîstiya xwe bi alîkarîdayîna hev bi pêş xistine. Ji bo alîkariyeke hevpar a rast were pêşxistin, bi kombûna çend eşîran konfederasyon ava kirine.

### Pirsên nirxandinê:

1- Konfederesyon, li ser kîjan têkîliyan tê avakirin?

2- Sedemên ku Kurdistan dibe qadeke şer û pevçûnan, çi ne?

3- Eşîrên kurdan ji bo xwe biparêzin, li cihên çawa diman?

## Şêweyê Giştî Yê Sazûmaniya Eşîrên Kurdan

Di dîroka mirovahiyê de li gorî demên taybet, civakan xwe birêxistin kirine. Rêveberiya siyasî, bazirganî, civakî û gelek şêweyên din hene. Di dema rêxistinbûyînên civakî de, carinan aliyê siyasî û carinan aliyê civakbûnê li pêş e. Ya rastî berjewendiyên civakê parastine. Li gorî vê sazî werin bidestgirtin, wê baştir be. Têkiliyên civakî li gorî herêm, nijad, ziman, çanda mirovan eşkere dibin. Di nava komên civakî yên cur bi cur de ev têkilî dibin sedema rêxistinên serbixwe û taybet. Carinan weke eşîr, carinan weke qebîle, carinan weke rêxistinên siyasî yên cur bi cur hatine destgirtin. Di roja me de ev aliyên civakî yên rêveberiyên siyasî bi riya partiyan tên meşandin. Lê di demên berê de bi riya eşîr û pergalên civakî



Eşîrên Kurdan

yên biçûk dihatin meşandin. Her rêxistinek li gorî xweseriya xwe şêwe-reng-form digire. Di nava têkilî û sazûmaniya êlî (eşîrî) de girêdana xwînê derbas dibe. Bi van hevgirtinan konfederasyon pêş dikevin. Modêla rêxistinên civakê, qebîle û eşîr in. Qebîle û eşîr avakirina dewletê nakin mebest. Rêxistinên bi vî awayî, modêlên avakirina konfederasyonan e. Ev konfederasyonên eşîran e.

## Di Modêla Xwebirêxistinkirina Qebîle û Eşîran De Sê Qonaxên Girîng Derbas Dibin


**Qonaxa yekem:**
Dema pêşketina çandinî, zevî û lawirvaniyê.

**Qonaxa duyem:**
Derbasbûna pergala eşîrtî û xwebirêxistinkirina wan.

**Qonaxa sêyem:**
Şêwegirtina şaristaniya navendî.










Dîmenên Eşîrên Kurdan

## Çêkera Eşîrtî

Di nava qebîle û eşîran de bingehekî aborî hatiye avakirin. Qebîle ji bo bikarin, xebatên xwe yên kolektîf pêk bînin, amûr û pêdiviyên civakê pêş bixin û bikarin jiyana xwe bidomînin, erkê wan ê sereke parastina xwe û qebîleya xwe ye. Xweparastin û xwebirêxistinkirin, encamên pêşketinên xwezayî yên bi hezarê salan in.

Dema ku di nava civakan de şêweyê eşîretê derket di plana duyemîn de, ji bo civakê formeke nû, qewm û nijad wate digire. Di rastiyê de eşîr bi giştî ji holê ranabin, lê tên guhertin. Li ser heman çandê jî, pir eşîrên nû ava bûne. Di nava van eşîran de rêvebirina hinek eşîran, ji jor ber bi jêr ve ango hiyerarşiyeke çînayetî bingeh digire û pergaleke desthilatdar didin avakirin. Di nava hinek eşîran de jî, bi şêweyê konfederal rêveberiyeke hevbeş û pergaleke demokratîk bingeh girtine û li ser vê bingehê xwe sazûman kirine.



Dîmenek Ji Civaka Eşîrtî

Di dema koledariyê de formên herî bingehîn eşîrên xwerû ne. Bi taybet ên ku derbasî çînayetiyê nebûne, di rewşeke wisa de ne. Lê di serdema navîn de formên civakî yên bingehîn qewm û milîyet in. Eşîrên ku di nava wan de çînayetî pêş ketiye, çîna jor ango rêveber, dema derbasî xanedaniyê dibe, çîna jêr xizan dibe. Êdî girîngiya eşîretbûyînê wateya xwe winda dike û êdî endamtiya çinayetî girîng dibe.

Di diyardeya kurdan de forma herî bi hêz forma eşîrê ye û hîna jî, vê hêza xwe dide meşandin. Kurd nêzî deh hezar sal berê, di rêzeçiyayên Toros û Zagrosê de bi awayê civakên Neolîtîk û formên eşîran jiyane. Di dîroka mirovahiyê ya 6000 salî B.Z de komên eşîran bi zanebûn tev geriyane.

## Pirsên nirxandinê:

1- Di dema rêxistinbûyînên civakî de, kîjan şêweyên rêveberiyê li pêş in?

2- Di modêla xwebirêxistinkirina qebîle û eşîran de her sê qonaxên girîng, çi ne?

3- Qebîle ji bo ku bikarin xebatên xwe yên kolektîf pêk bînin, çi dikin?

4- Bersiva rast hilbijêre

- Qebîle û eşîr avakirina dewletê
A) Dikin mebest B) Nakin mebest C) Pêwîst dibînin

- Di diyardeya kurdan de forma herî bi hêz kîjan e?
A) Eşîr e B) Dewlet e C) Dsthilatdarî ye

- Xweparastin û xwebirêxistinkirin, encamên pêşketinên
A) Çêkirî ne B) Xwezayî ne C) Ne pêwîst in

## Konfederasyona Medan

Dema ku Medan weke qebîleyekê xwe bi rêxistin kirin û ketin nava rûpelên dîrokê, li herêmê desthilatdariya İmparatoriya Asûr pir xurt û bi hêz dihat meşandin. Ji Derya Spî heya Çiyayê Zagrosê, ji Kendavê heya Amedê herêmeke berfireh û civakên ku li vê herêmê dijiyan, di bin desthilatdariya İmparatoriya Asûr de bûn. Imparatoriya Asûr, li ser civaka ku dagir kiriye, stemkariyeke pir mezin dimeşand. Heman tişt li ser Medan û qebîleyên din ên kurdan jî, dihat meşandin. Ji ber vê sedemê, nerazîbûneke giştî di nava van civakan de pêş ketibû. Bê guman nerazîbûna Medan zêdetir bû û demeke dirêj li hemberî vê desthilatdariyê, şerê azadiyê didan meşandin. Ew nerazîbûyîn di nava wan civakan de bingehên têkilî û peymanan dide pêşxistin. Rêveberê Medan Keyakser jî vê dibîne û li ser bingehê wekheviyeke tevlîbûyînê, hevkariyekê çêdike. Ew hevkariya ku di nava civakan de hatî avakirin bi Konfederasyonê tê binavkirin. Ji ber ku Med di vê hevpeymanê de hêza herî mezin bû, pêşengî kiribûn û rêvebertî di destê wan de bû. Bi vî awayî konfederasyon jî, bi navê Medan hat pênasekirin. Konfederesyona Medan li ser vê bingehê ava bûbû.

Di konfederesyona ku hatî avakirin de desthilatdarî tune bû û li ser desthilatdariyê jî, nehatibû avakirin. Konfederesyon bi xwe li ser têkîliyên bi xwestek, li ser girêdayînên ne pir hişk tên avakirin. Tevlîbûyîn ango jêveqetîn jî, bi xwestek çêdibe. Rêbazê wê jî weke demokrasiyê ye.

Di aliyê hişmendî de konfedresyona medî li ser bingehê felsefeya zerdeşt ava bûye. Bêyî felsefeya zerdeşt pênasekirina konfedresyona medî wê kêm bimîne. Cara yekem li kurdistanê hişmendiya ku li ser bingehê welatparêziyê hatiye avakirin hişmeniya zerdeşt e. Li ser

ramana eşîrtiyê ramaneke hîn mezintir hatiye avakirin, eşîrên ku hatine gel hev ne tenê ji bo xweparastinê, ji bo vê ramana nû kom bûne û konfedresyon ava kirine.


Koçberkirina Kurdan

Ji sala 1300'î B.Z û şûn de, Asûrî sîstema xwe ya koledariyê berfireh dikin û xwe digihînin hêza herî mezin. Asûran bê navber êrîşên pir mezin li ser herêmên derdora xwe pêk tanîn. Mafê jiyanê nedidan civakan. Ji ber dewlemendiya welatê Medya, li ser civaka Med ev êrîş zêdetir dibûn. Di encama êrîşên li ser wan qebîle û eşîran de, pir mirov tên kuştin û jiyaneke koçberiyê tê destpêkirin. Di bin van mercan de qebîle û eşîrên di herêmê de jiyana xwe di bin zor û zehmetiyan de derbas kirine, ji wan re du rê hatibûn hiştin an wê koletî bipejirandana an jî, wê li gorî xwe berxwedaniyeke mezin bidana destpêkirin. Qebîle û eşîrên herêmê berxwedana mezin hilbijartin û heya niha jî berxwedanî didome. Dîroknas Heredot, li ser dîroka pêşiyên kurdan bi taybet jî, li ser Medan di pirtûka xwe de cihekî berfireh dide veqetandin.




Li gorî lêkolîn û nêrînên li ser dîroka Medan bi taybet sînorê ku Medan xwe gihandinê bi aweyekî zelal û berfireh diyar dibe. Sînorên Medan li Rojava-Mezopotamya jor, li Başûr-welatê Persan, li Rojhilat-welatê Parta û li Bakur jî heya Derya Xezer berfireh dibe.

Medan di demeke kin de xwe gihandine sînorên îro yên Kurdistanê. Herêmên derdor dikevin bin rêveberiya Medan. Di sala 595 B.Z de li derdora Çemê Sor, Med li hemberî Lîdyayiyan şer dikin. Ev şer demeke pir dirêj digire (6 salan didome). Di encama vî şerî de Çemê Sor weke sînor tê pejirandin û di navbera her du hêzan de aştî çêdibe.

## Diyako (Diyokes)




Diyako weke damezrînerê yekemîn ê konfederasyona Medya tê nasîn. Di sala 751 B.Z de, di pêvajoya rêvebertiya vî qralî de welatê Medya weke hêzeke nû derdikeve pêş. Med û eşîrên din ên pêşiyên kurdan li derdora wî kom dibin.

Diyako girîngiyeke mezin dida dadê. Rêveberiyeke baş dida meşandin. Ji bo parastina welatê xwe keleh dane avakirin. Li dijî êrîşên Asûran radiweste. Di dema rêveberiya Diyako de, di nava civakê de gelek pêşketinên berbiçav çêdibin. Diyako bajarê Ekbatanê (Hemedan) dike paytexta xwe. 53 salan rêveberiyeke serkeftî derbas dike. Piştî mirina Diyako kurê wî yê bi navê **Firawertîs** cihê wî digire.

## Firawertîs (Firortîş) (655 B.Z)

Firortîş di dema xwe de hinek qebîleyên ku ji aliyê rojhilat ve hatine, yên di koka xwe de qebîleyên Arî ne, digire nava xwe. Di heman demê de civakên Persan jî, bi rêveberiya xwe ve dide girêdan. Bi van pêşketinan, Med bi hêz û mezintir dibin. Firortîş ji rewşa erênî ya ku derketiye holê sûdê werdigire, serî natewîne û li hemberî Asûran têkoşîna xwe radigihîne. Ew tu caran bandor û gefên Asûran ên li ser welatê xwe napejirîne.

Pêşveçûnên ku li welatê Medya û di nava Gelên Medan de çêdibin, bala Asûran jî dikişînin ser xwe. Rewşa ku derket-

iye holê, ji bo Asûran metirsiyek dida çêkirin. Asûrî li ser vê çendê rewşa ku derketiye, ji bo ku ji holê rakin, li ser qebîle û welatê Medan êrîşên pir mezin didin destpêkirin. Di van êrîşan de, di navbera Asûr û Medan de şer tê destpêkirin. Di vî şerî de Firortîş û piraniya serokeşîrên Medan ji aliyê Asûran ve tên kuştin (633 B.Z).



### Pirsên nirxandinê:

1- Berfirehbûna Medan li ser nexşeyê bi cih bike.

2- çima konfedrasyona eşîran li ser navê Medan hat binavkirin?

3- Damezirînerê yekem ê konfederasyona Medya, pergaleke çawa da meşandin?

4- Firortîş li hemberî Asûran têkoşîna xwe çawa radigihîne?

5- Hevokên rast bi (R), yên şaş bi (Ş) nîşan bike.

- Dîroknas Heredot di pirtûka xwe de cihekî fireh ji kurdan re veqetandiye. ( )

- Piraniya serokeşîrên Medan ji aliyê Asûran ve tên kuştin (533 B.Z). ( )

- Diyako girîngiyeke mezin dida dadê. ( )

- Ji ber hejariya welatê Medya, li ser civaka Med ev êrîş zêdetir dibûn. ( )

## Keyakser (633 B.Z)



Piştî ku Firortîş di şerê Asûran de tê kuştin, birayê wî Keyakser şûna wî digire. Rêveberiya Medan dikeve destê wî. Keyakser fermanda-rekî baş, rêveberekî hişyar û zana ye. Keyakser destpêkê, ji nû ve artêşa Medyayê birêxistin dike. Piştî têkçûna Firortîş, Keyakser pir encaman bi dest dixe. Li gorî van encaman sazûmaniyeke artêşa Medan dide destpêkirin.

Keyakser hêzeke hemdem çêdike. Artêşa xwe weke siwar û peya şêweyê du baskan bi rêxistin dike. Piştî temamkirina perwerdeya leşkerî û sazûmaniya artêşê, li hemberî Asûran dest bi xebatên hevkariyê dike. Bi qralê Babilê yê wê demê Nabopolasar re peymaneke hevkariyê çêdike. Dema amadekarî tê bidawîkirin, di 1'ê Çileya 615'an B.Z de bi artêşeke mezin dikeve rê. Bi artêşa xwe dikeve nava welatê Asûran. Di demeke kin de bajarê Arabxa (kerkûk) dagir dike û ji bo tevgera xwe bajêr dike navend. Artêşa Medya ya di bin rêveberiya Keyaksar de, di sala 614 B.Z de berê xwe dide paytexta Asûr Neynewayê. Beriya ku bigihêje Neynewayê, bajarê Arbezî, yê li ser riya xwe dagir dike.

Du salan pîştî dagirkirina bajarê Asûr (Şirqat) ango di 612'an B.Z de hêzên Med û Babil bi eniyeke berfireh ji sê milan ve êrîşeke mezin dibin ser paytexta Asûran a bi navê Neynewayê. Li gorî lêkolînan, Neynewa sê mehan di nava dorpêçê de dimîne û piştî cengeke pir dijwar 21'ê Adara 612'an B.Z dikeve destê Medan. Ew roj ji bo Gelê Med dibe roja serkeftin û azadiyê. Ji ber ku hêzeke weke Asûran, a ku pergala koledariya di asta herî jor de hatibû rûniştandin û

azadiya gelan desteser kiribû, ji holê hatibû rakirin. Ev ji bo Medan bû roja cejna Newrozê.

## Astiyag



Piştî mirina Keyakser, kurê wî yê bi navê Astiyag dikeve cihê wî. Di dema Astiyag de di nava rêveberiya Medan de pir komplo û dek û dolab pêş dikevin. Di dema rêveberiya Astiyag de tu pêşketin nehatin çêkirin. Destkeftiyên heyî jî, nehatin parastin. Em dikarin bêjin ku rêveberiya Medan di encama xiyaneteke navxweyî de têk çûye. Piştî têkçûna Medan, eşîrên Persan di bin rêveberiya Kîros de tên sazûmankirin. Di dema rêveberiya Astiyag de fermandarê bi navê Harpagos xiyanetê dike. Di encama vê xiyanetê de rêveberiya Medan bi dawî dibe (550-549’an B.Zde) û rêveberî dikeve destê Persan.



Li gorî dîroka Heredot, Astiyag ji Harpagos re wiha gotiye: “Hey mirovê nemerd, te xiyanet li min kir û te qraliyet hilweşand. Herî kêm tu bi xwe ketibûya cihê min. Madem te ev jî nekir, herî kêm te qraliyet daba destê Medan. Çima te bi şêweyekî pir nemerdî, da destê Kîrosê Persî... ”


## Bandora Bawerî-Ol û Çanda Zerdeşt li Ser Medan



Ahûra Mezda

Civaka Medan civaka Çand-Zimanê Aryen e. Dema ku Neolîtîka biberhem jiyaye, Şoreşa mezin a mirovahiyê ava kiriye. Ev çand û berhem, li hemû cîhanê belav kiriye. Hemû berhemên pêwîstiyên mirovahiyê afirandine. Baweriya civaka kurdan ji dema Neolîtîkê tê. Çanda Neolîtîkê bandorî li ser ola Zerdeştî kiriye. Heman wateya jiyanê diparêze. Berhemdariya lawiran, pîroziya şînatiyan, pîroziya dayîka xwedawend, girîngiya komên civakî, baweriya ji endamên komên civakî re, di dema şoreşa Neolîtîkê de jî hebû û di baweriya Zerdeşt de jî, ev pîrozbahî heye. Her wiha ev çanda dema Neolîtîkê bi baweriya Zerdeşt dixwaze zindî bibe.





## Pirsên nirxandinê:

1- Keyakser, hêzeke çawa ava kir?

2- Medan, bi kê re hevpeyman çêkir û li dijî kê rabûn?


3- 21’ê Adarê 612 B.Z tê çi wateyê?

4- Çi xalên hevbeş di navbera baweriya Çanda Neolîtîkê û Ola Zerdeştî de hene?

5- Di dema Astiyag de çima Med têk çûn û çawa destlatdarî ket destê Kîrosê persî?

## Bandora Bawerî-Ol û Çanda Zerdeşt li Ser Medan

Civaka Medan li ser çanda şoreşa Neolîtîkê xwe tîmar kiriye. Ev çanda şoreşa Neolîtîkê di baweriya Zerdeşt de xwe ava kiriye. Bi felsefeya Zerdeşt di dema Asûran de li hemberî koledariyê têkoşîneke mezin tê dayîn. Ji ber ku di dema desthilatdariya İmparatoriya Asûran de civak hatibûn kolekirin û vîna mirovan nedihat nasîn. Konfederasyona Medan ji eşîrên niştecih û koçer pêk dihat. Vê bi xwe re dewlemendiyek jî ava dikir. Şêweyê avakirin û rêxistinkirinên eşîran, çand û zimanên wan ên dewlemend bingeh girtiye. Di heman demê de lawirvanî, çandinî jî bingeh girtine. Ji bo xweparastinê amûr û navgînên nû pêş xistine. Vê jî hiştiye ku di civakbûyînê de pir pêşketinên mezin bi xwe re bînin. Bi van pêşketinan re Med li hemberî pergala koletiyê di aliyê ramyarî, hişmendî, çandî û civakbûyînê de têkoşînê dide meşandin. Vê têkoşînê bi xwe re çand û baweriya mezin daye avakirin. Medan ji bo pêşeroja civak, gel, şaristanî û imparatoriyan bingehê çand û dîrokeke dewlemend ava kiriye. Bi taybet ji Sumer, Gûtî, Med, Pers, Grek, Roma, Sasanî û heya Îrana roja me, em dikarin vê rastiyê bibînin û çavdêrî bikin. Mezinbûn û hêzbûna Medan bingehê xwe ji bawerî û felsefeya Zerdeşt digire.



Kolekirina Mirovan

## Di Nasnameya Qebîlebûna Kurdan de Bandora Medan

Gavavêtina Medan pêngaveke girîng û dîrokî ye. Med ji bo nasname û neteweya kurdan weke pêşiyên kurdan tên nasîn. Heredot dema behsa Medan dike, wan weke gelê herî pêşketî dibîne. Di pirtûka xwe de dibêje:"Pers û Grek şagirtên Medan in, Ji Medan fêrî çanda Aryen a şoreşa çandiniyê dibin" Şaristaniyên Derya Ege, Îtalya, Pers û Helen bingehên xwe ji çanda Medan digirin û li ser vî bingehî jî, pêşketinên pir mezin ava dikin. Bi taybet şaristaniya Helen-Grek çanda rojhilat derbasî rojava kirine û li ser bingehê vê çandê di aliyê hişmendî, huner, felsefe û hwd. de guhertinên pir mezin ava kirine.



## Huner


Di nava civaka kurd de nîşanyên huner, piraniya xwe destan in. Ji ber ku di nava destanan de piraniya xwe, qehremantî tên ser ziman, bi dibetiyeke pir mezin di demên pêşketina hiyerarşiyan de hatine destgirtin. Di destan û




stranên Mem û Zîn, Memê Alan û Derwêşê Evdî de ev heye. Her wiha dibetiyeke mezin heye ku 4.000 salî B.Z ev destkeftiyên ji Hûriyan derbasî Sumeran bûne û heya roja me hatine. Pêşbirk, stran, dîlanên kurdan di Rojhilata Navîn de hunerên herî dewlemend in. A ku jiyan û dîroka wan heya roja me aniye, hunera kurdan e. Hebûna kurdan di nava dîrokê de herî zêde bi riya pêşbirk, helbest û stranan derdikeve holê. Em vê rastiyê, di nava pergala ku di nava van huneran de dane rûniştandin de

dibînin. Di heman demê de em dikarin vê rastiyê di liv û tevgera jinên kurd de jî, bibînîn. Bi taybet lixwekirina cil û bergan û tevgerên jina kurd ên xwedî estetîk-xweşikbûn û hunerên vê rastiyê derdixin ber çavan.

## Leşkerî


Leşker

Gelekî xwedî çand û dîrokeke ew qas kevnar e, di heman demê de di warê leşkerî de jî, xwedî bingehekî mezin bû. Artêşa wan bi çend baskan hatibû beşkirin, weke siwar, peya, rim-avêj, şûr, tîr û kevan bûn. Artêşa Medan bi sazûmanî û rêxistî bû. Artêşa wan li gorî rewşên asayî û awarte hemdemî bû. Lê dema aramiyê, leşkerên wan bi giranî di nava hilberînê de cih digirtin...



## Çandinî û Aborî

Gelê Kurd di aliyê çandî de li ser şûnwarên dewlemend bi cih bûbûn. Çanda çandiniyê civakîbûn, lawirvanî, cotkarî, konevanî, bazirganî û baweriya bi olê ve pêş xistibûn. Di nava Medan de ola Zerdeşt muhra xwe li her tiştî dabû, bi taybet li gorî baweriya Zerdeşt, jiyîna civakê li ser bingehê çanda berxwedanê ye. Rengê xwe yê herî rast digire, di çanda wan de ne şer; aştî, ne dijminahî; biratî, ne ku bibin kole ji yên din re; çanda wekheviyê ji xwe re bingeh girtibûn.

### Pirsên nirxandinê:

1- Bersiva rast hibijêre.

- Konfederasyona Medan, ji eşîrên

A) Niştecih B) Koçer C) Niştecih û Koçer pêk dihat.

- Artêşa Medan ji

A) Yek baskî B) Du baskan C) Pir baskan pêk dihat.

- Gelê kurd di aliyê çandî de li ser şûnwarên………. bi cih bûbûn.

A) Dewlemend B) Hejar C) Bê av


2- Lehengî û qehremantiya kurdan di ku de hatiye ziman? Çend mînakan bide.

3- Heredot, çawa behsa Medan dike?

4- Tu dikarî rastiya pêşketina hunera Rojhilata Navîn dema niha, di kû de bibînî?

## DEMA MED-PERS

### IMPARATORIYA MED-PERS (550-330 B.Z)




Konfederasyona Medan piştî demekê û şûnde vedigere imparatoriyeke mezin, lê belê piştî demekê û şûnde di nava İmparatoriya Medan de alîgirên xanedaniyê pêş dikevin û di sala 550'î B.Z de imparatoriya Med dikeve destê xanedaniya Akhamenîd-İmparatoriya Farisan (Persan). Di sala 550'î B.Z de, bi dawîhatina rêveberiya Medan re, rêveberiya Persan tê avakirin. Pers ji Başûr-Rojavayê Iranê ne. Xwedî Çand–Zimanê Aryen in. Zanînên li ser Persan, di hinek belgeyên Asûran ên berî zayînê di sedsala dehan de hene. Her çi qas rêveberî ketibû destê Persan de jî, lê di aliyê çandê de Med xwediyê bandoreke mezin in, di heman demê de, di milê leşkerî de xwediyê huner in. Ev taybetmendiyên Medan bandora xwe li ser imparatoriya Persan dikir. Dema ku em imparatoriya Persan dinirxînin, pêwîst e weke dewama Medan were destgirtin. İmparatoriya Med-Persan li derdora sêsed salî ji Misrê heta hundirê Hindistanê (515 B.Z) serdest dike, ji sînorê Çînê heta



Nîvgirava Yewnanê, yekîtiya ramyarî ya herî berfireh a demê pêk aniye. Şaristaniya Yewnanê gelek hîmên xwe yên çandî, ji Med û Persan girtî ye.

## Dîroka Persan Bi Kurtasî

### Dema Rêveberiya Persan


Piştî Medan desthilatdarî dikeve destê Kîrosê persî. Kîros, hêzeke leşkerî ya pir bi disiplîn ava dike. Pers bi Babilan re dikevin nava şer, Babil tê hilweşandin.

Qraliyeta Persan sînorên xwe heta sînorên Yewnan, Hindistan û Misrê fireh dike. Bi Lîdyayê re dikevin şerekî dijwar. Di mehên destpêkê de Pers tu encaman nagirin, piştî sê mehan û şûnde Pers careke din êrîşî Lîdyayê dikin. Di milê Potrium (boxazkoy) de êrîş dikin. Dewleta Lîdya ji holê tê rakirin. Kîros piranî fermandarên ku berê cihê xwe di artêşa konfederasyona Medan de girtibûn, digire nava artêşa xwe. Ezmûn, tecrûbe û zanista wan a ku di nava artêşa Medan de çêbûye, di bin rêveberiya Persan de jî, erkekî girîng digirin. Kîros xwe digihîne hêzeke mezin. Hêzên desthilatdar ên Persan bi rêveberên eşîrên Medan re hevdîtin û peymanan çêdikin. Piştî wê kurd bi şêweyê eşîran jiyana xwe didomînin. Kurd di aliyê civakî û çandî de pêşengiyê dikin, Pers, ji aliyê ramyarî weke hêza herî sereke, pêşengî didan meşandin. Kîros eşîrên Persan dike navend. Babilê dagir dike, sirgûnên ku cihûyan 40 salan dijiyan, bi dawî tîne.

### Dema Kambîs

Kambîs amadekariyên ji bo Misrê dihatin kirin, temam dike. Diçe ser Misrê û dagir dike. Piştî dagirkirina Misrê, artêşa Persan berê xwe dide Kertaca, lê belê li hemberî berxwedaniya Kertaciyan hêzên xwe şûn de dikişîne. Kambîs di demên êrîşên Misrê de dimire. Di van deman de bi pêşengiya rahîbên Medan, serhildanên gel pêş dikevin, di nava van serhildanan de ya herî bi hêz û navdar serhildana rahîbê Medan ê bi navê Gomata ye. Ev serhildan di demeke kin de

belavî pir cihan û mezin dibe. Bi taybet Mecûsiyên ku ji desthilatdariya Persan pir êş kişandibûn tevlîbûneke mezin ji serhildanê re çêkirine.




**Dema Darîus**

Pîştî mirina Kambîs fermandarê bi navê Darîus dikeve cihê wî. Darîus, êrîşên ji derve dide rawestandin, hêzên xwe şûn de dikişîne û destwerdana serhildanên navxweyî dike û dide rawestandin. Piştî yekîtiyeke navxweyî çêdike û şûnde êrîşên xwe yên ji derve dide destpêkirin. Di dema Darîus de sînorên Persan ên rojhilat heya Hindistanê, sînorê bakur heya Qafqasyayê diçe. Lê li hemberî Îskîtiyan serkeftinê çênakin. Li ser Anatolya rojava, Trakya û Makedonyayê, êrîşan pêk tînin. Lê belê Spartî bi Atîna û sîteyên dewletên Yewnanê re dibin yek û nahêlin Pers pêşde biçin. Trakya di navbera Pers û Yewnaniyan de dibe cihekî herêma biewle.

**Dema Artakserkesê Duyem (480 B.Z.)**




Piştî mirina Darîus, kurê wî Artakserkesê duyem dikeve şûna wî (sala 480 B.Z). Artakserkes, piştî deh salan careke din xwe amede dike û êrîşî Yewnaniyan dike. pêwîst bû Artakserkes (Kserkses), şaşitiya ku bavê wî Darîus kiribû dubare neke. Dema Yewnaniyan amadekariya xwe dikir, di aliyên din de jî, artêşa Persan xwe gihandibû nêzî axên Yewnaniyan. Di demeke wisa de ba û bahozeke mezin radibe. Şer û firtona ku li deryayê hatibû destpêkirin Persan ji xwe re nekiribû asteng. Lê belê pir windahiyên Persan çêdibin. Alîkariya ku li ser deryayê ji Persan re dihat kirin,

ji ber firtoneyê derbeyeke mezin dixwin. Bi vî şêweyî, Pers di milê deryayê de lewaz dibin. Bi taybet di aliyê lojîstîk û cebilxaneyê de ev tengavî dihatin jiyîn.

Artêşa Persan pergala xwe bi rêxistinkirina xwe li ser bingehê komên ji 10 kesan, 100 yekîne, 1000 tabûr-ketîbe, 10.000 tûmen ava dikirin. Artêşa Persan piraniya xwe ji Medan pêk dihat. Di heman demê de, di nava artêşa Persan de



leşkerên nemir jî hebûn, hejmara wan nêzî 10.000'an bû. Leşkerên ku ji aliyê taktîkî û disiplînê ve yên herî baş hatibûn perwerdekirin, di van yekîneyan de cih digirtin.

**Pirsên nirxandinê:**

1- Piştî ku rêveberî dikeve destê Persan, kîjan çandê bingeh digirin?

2- Imparatoriya Med-Persan, ji kû ta kû fireh dibe?

3- Di dema Kambîs de kîjan serhildan radibe û kî pêşengtiyê jê re dike?

4- Pîştî mirina Kambîs, Darîus çi guhertinan çêdike?

5- Di dema şerê Artekserkes bi Yewnanan re, sedemên têkçûnê çi bûn?

## ŞERÊN PERS-GREK (YEWNAN) Û ENCAMÊN WAN

Imparatoriya Pers bi armanca sînorên xwe berfireh bike û serweriya xwe belav bike, her dem sînorên xwe ber bi derve berfireh kirine. Artêşa Pers sînorên wan li rojhilat xwe dispêre Hindistanê. Li rojava jî, digihêje deriyê Trakya. Peravên Ege yên di axa Yewnanê de, bi dest dixin. Riya digihêje heya Persepolis a weke "riya qral " diyar dike, ka Persan di axeke çend berfireh de desthilatiya xwe meşandine. Lê desthilatdariya li ser qadeke berfireh, sedema ne aramiya di navbera gelan de ye. Her wiha dibe sedema pêşketina serhildanan. Gelên di perava Egeyê de dijîn, bi alîkariya dewleta Yewnanê serhildan pêş xistin. Di hinek ji van serhildanan de serkeftin jî, bi dest xistin. Ev şerên êrîşî di salên 490'an B.Z de pêk tên. Hêzên deryayî yên Persan hinek giravên Yewnanan ên di Deryaya Egeyê de, bi dest dixin. Artêşa xwe di deşta Maratonê re derdixe bejahiyê. Li vê derê artêşa Yewnan û Persan tên pêşberî hev. Di vê deştê de, di şerê ku navê xwe ji vê deştê girtî de, Pers windahiyên mezin didin û dişkin. Ji qada şer vedikişin. Darîus ji bo ku tola vê şkestinê bistîne, dest bi amadekariyên şerekî nû dike. Di vê navberê de li Misrê serhildan çêdibin. Ji ber vê sedemê, şerê ku amadekariya wî hatî kirin tê paşdexistin, li vê derê Darîus dimire. Artakserkesê kurê wî, dikeve cihê wî. Ew jî bi mebesta temamkirina şerê ku bavê wî jê re amadekarî kiribû dikeve êrîşê. Bi vî awayî şerê duyem ê mezin di dîroka 480'an B.Z de dest pê dike.


Dîmenek Ji Şerên Persan


Qral Darîusê 3.

Artêşa Pers, artêşa herî mezin a heya wê demê bû. Em dikarin bêjin ku di hemû şerên ketibûyê de, bi serkeftî bû û îmajeke weke ku Artêşa Pers naşike, dabû nîşankirin. Sînorên artêşa Pers, ji Hindistanê heya peravên Egeyê berfireh bûbûn û hejmareke zêde netewe ketibûn bin desthilatiya imparatoriyê. Zordariyên mezin li wan dihatin kirin. Şkestina wan a li deşta Maratonê ji bo İmparatoriya Persan encamên pir giran li gel xwe anîn. Şkestina imparatoriya ku heya wê demê bi çavê ku naşkê, lê dihat mêzekirin, bû sedema serhildana gelên di bin desthilatdariya wê de. Ev jî ji bo imparatoriyê dibe despêka dawîlêhatinê. Imparatoriya Pers ji vê dîrokê û şûn de bi berdewam paş dikeve û teng dibe. Derbeya dawî jî, ji aliyê Îskenderê Mezin ve di dîroka 331'ê  B.Z de li nêzî Hewlêrê di şerê Guagemala de lê dikeve. Qral Darîusê 3. tê kuştin û beşeke mezin a artêşa wî tune dibe. Yên din jî, belav dibin.

### Pirsên nirxandinê:

1- Pers, bi çi armancê dixwazin sînorên xwe berfireh bikin?

2- Sedemên dawîlêhatina Persan, çi ne?

3- Imparatoriya Persan kengî, di kîjan şerî de û li ser destên kê tê şkandin?

4- Bi çi çavî li artêşa Persan dihat mêzekirin?

5- Firehiya Imparatoriya Persan bi sînor bike.


## ÎSKENDER Û HELENÎZM

Iskenderê mezin kurê Fîlîp (Flîppos) ê Qralê Makdonya ye. Hîna di zarokatiya xwe de bi mamostetiya Arîsto Tales tê mezinkirin. Nêrîna Aristo ya ji bo neteweyên ji derveyî Yewnanan cihê xwe di hizir û bîra Iskender de digire. Arîsto, ji bo Gelên Rojhilat digot: Tiral û gêj in. Bi vê ve girêdayî, gotibû: Pêwîst e ev netewe, weke moriyan bên perçiqandin.


Îskender

Dema bavê wî tê kuştin, Iskenderê Mezin diçe şûna wî. Piştî Iskenderê Mezin desthilatdariyê dixe destê xwe, yekîneyên xwecihî yên qebîleyên Makîdon ên belav dagir dike. Piştre bi ser Sûriye û Filistînê de diçe û berê xwe dide Misrê. Dema van cihan bi dest dixe, berê xwe dide axa Persan. Di tîrmeha sala 331'ê B.Z de Darîusê 3. dişkîne û dawî li İmparatoriya Persê tîne. Berê xwe dide Persepolisê (Paytext) û wê derê jî, dixe destê xwe. Piştre Artakserkesê dişewitîne. Vê carê berê xwe dide Hindistanê. Piştî vê derê jî, dixe destê xwe, vedigere li Babilê di sala 323'yan B.Z de bi tayê dimire. Lê piştî ku ew dimire ji aliyê fermandarên İmparatoriyê ve wê qada berfireh li Qraliyetên cuda belav dike. Ji van Qraliyetan a herî girîng û binav û deng dikeve pelên dîrokê.

Dema Iskender berê xwe dide rojhilat, ji çanda wê pir bandor dibe. Ji ber vê bi deh hezaran leşkerên Yewnanan bi jinên rojhilat re dide zewicandin. Di aliyê fîzîkî de jî, vê sentezê çêdike. Ev senteza çandê weke Helenîst, tê îfadekirin. Ev di salên 330 -150'yan B.Z de bi bandor bû.Tevahî rojhilata nêzîk, di van salan de ket bin bandora Helenîstê de. Ev nêzîkatî muhra xwe li çêkerên mîmarî û hunerî yên wê demê xistin û bi navê Helenîstê, tê nasîn.


Helen

# XANEDANIYA PART



Xanedaniya Part

Partan di salên 249'an B.Z û 228'an P.Z de li Îran, Mezopotamya, Anatolya û li Rojhilata Navîn pêşengî kirine. Part bi koka xwe ji neteweyên Arî ne. Ev netewe bi çanda xwe ya berxwedaniyê û têkoşînkirinê di pêş de ne. Navenda wan Xorasan e. 500 salan bi şêweyê xanedaniyê desthilatdarî kirine û xwe bi rê ve birine. Berxwedaniya Partan li Îranê, herêma Xorasanê pêş dikeve. Li dijî dagirkirina Qraliyeta Selefkosan serî hildidin. Eşîra Arşaka (Arsaki) pêşengiya vê berxwedaniyê dike.

Di salên 330'î de ji aliyê Iskenderê Mezin ve İmparatoriya Persan tê hilweşandin. Ev qad dikeve bin desthilatdariya Helenan. Lê belê bi mirina Iskenderê Mezin re, rê li ber parçebûna İmparatoriya Iskender vedibe. İmparatorî dibe sê parçe û dewletên cuda cuda tên avakirin. Li Misrê, li Rojavayê Anatolya Bergama, li Mezopotamya, Qafqas û Îranê bi şêweyê sê dewletên cuda tên avakirin. Mezopotamya, Qafqas û Îrana îro, dikevin bin desthilatdariya Selefkosan. Desthilatdariya ku Selefkosan dimeşand, di aliyê gelan de, bêzariyeke mezin dabû avakirin. Eşîrên ku li çiya, zozan û beravên biçûk jiyaneke azad dijiyan, desthilatdariya Selefkosan, dagirî û koletiya ku li ser civakan dabûn avakirin, nedipejirandin. Ji bo bikarin xwe rizgar bikin û ji bin desthilatdariya Selefkosan derkevin, bi şêweyê konfederasyona eşîran xwe birêxistin dikin. Yên ku pêşengiya vê sazûmaniyê dikirin, eşîra Arşakan in. Li ser bingehê vê sazûmaniyê, li dijî Selefkosan têkoşînê dikin û wan ji herêmê derdixin.

**Pirsên nirxandinê:**

1- Nêrînên Arîsto yên di derbarê Rojhilat de û bandor li ser Îskender kiribûn, çi ne?

2- Piştî ku Îskender desthilatiyê dixe destê xwe de, çi dike?

3- Îskender; kengî, li ku û çawa dimire?

4- Hevokên rast bi tîpa (R), yên şaş bi tîpa (Ş) nîşan bike.

- Îskender Artakserkesê dişewitîne. ( )

- Piştî mirina Îskender, imparatorî bû du parçe. ( )

- Îskender bi hezaran leşkerên xwe bi jinên Rojhilat re zewicandin. ( )

## IMPARATORIYA ROMA-1

Bilindbûn û mezinbûna Roma, bingehê xwe ji konfederasyona Etrûskên ku ji 12 herêman pêk dihat digire. Di heman demê de ji çanda Neolîtîkê ya ku gihîştiye van deran û gelên ku koka xwe latînî ne, di sala 1000'î B.Z de, di karanîna hesin de pispor bûne. Etrûskî, bi riya Anatolyayê berhemên Mezopotamya anîne Romayê. Çavkaniya ku Roma tîmar dike Etrûskî ne.



Li milê başûr Heleniyan Mêtingehên xwe ava kirine û rewşeke nû li Anatolya Rojava jî, ava kirine. Li van deran bajarên dewletok ava kirine. Di milê aborî-bazirganî, çandî û bîrdozî de, desthilatiyek dane çêkirin. Di milê başûr de Qraliyeta Sîrakûza û di milê bakur de li Efrîqayê şaristaniya Qertacayê ku koka xwe ji Fenîkiyan digirt, dema xwe ya herî pêşketî jiyaye. Bandorên şaristaniyên Rojhilata Navîn hemû bi van riyan dikevin nava çanda Roma û Roma li ser van heyîn û hebûnan, pergala xwe dide avakirin. Di sala 750'î B.Z de Roma heyîneke bajar, dewletokeke Qraliyetê bû. Her çi qas bandora Etrûskan hebe jî, lê komên ku koka xwe latînî ne bi demê re zêdetir bandora xwe didin avakirin. Di sala 500'î B.Z de Roma, bingehê komara xwe ya ku ji latînî digirt, ava kir. Bi avakirina komarê re ber bi bilinbûnê ve diçe û ew cudabûna ku di nava gelan de kêm be jî, sererast dike.


Civaka Roma

Bi taybet, çînayetiya ku di nava gelan de tengezarî çêdikir, pir caran dibû sedem ku şer û pevçûnan pêş bixe. Weke

Patrîcî-esilzade (çîna jor), Plebî-feqîr, Kole (çîna jêr). Bi avabûna komarê re, ev nakokî hinekî ji holê hatin rakirin. Avakirina senato û meclisan nirxekî mezin dide avakirin. Mafên ku berê tune bûn, ji Romayiyan re dihatin dayîn, bi avabûn û sazûmankirina komarê re ev mafên ku ji bo hemû gelên di Romayê de dijiyan, bûn giştî.



Çînayetiya Romayê



1-Patrîcî: Ev beş xwedî hemû mafan in, dikarin tevlî rêveberiyê bibin.

2-Plepî: Mafê vê beşê yê ramyariyê tuneye. Beşên cotkar, gundî û pîşekar in.

3-Kole: Ev beş ne xwediyê tu mafan in. Ne mafên ramyarî, ne jî civakî.

**Pirsên nirxandinê:**

1- Roma, bingehê bilindbûn û mezinbûna xwe ji ku girtiye?

2- Etrûskan, berhemên Mezopotamyayê çawa anîne Romayê?

3- Bi avakirina komarê re çi guherîn di Romayê de çêdibin?

4- Qatên çînayetiyê yên li Romayê bi nav bike.

## IMPARATORIYA ROMA-2

### Li Romayê Şêweyên Rêvebirinê

1- Dema qraliyetê: 753- 510'an B.Z

2- Dema komarê: 510 -27'an B.Z

3- Dema imparatoriyê: 27'an B.Z- 395'an P.Z

Imparatoriya Roma di sala 27'an B.Z de bi rêveberiya Agustus hatiye damezrandin. Di sedsala 4'an de imparatorî dibe du parçe, parçeya Rojava ya ku paytexta wê Roma ye, piştre di sala 476’an P.Z de dikeve bin destê Cermenan. Parçeya Rojhilat (Bîzans) a ku paytexta wê bû Konstantîn, di sala 1453'yan de dema ku dewleta Osmaniyan Konstantînê (Stenbol) dixin bin desthilatdariya xwe, imparatoriya Romayê bi şêweyekî fermî bi dawî dibe. Bi hilweşandina imparatoriya Bîzansan serdema navîn, bi dawî dibe û serdema nû dest pê dike.




### 1- Dema Qraliyetê: 753-510'an B.Z

Dema ku Imparatoriya Romayê tê avakirin, cara yekem li ser hemû welatên Deryaya Spî desthilatiya xwe dide meşandin. Dewleta bajarê Roma kengî hatiye avakirin, tam nayê zanîn. Lê, li gorî lêkolîn û nêrînên heyî, diyar dikin ku di sala 1000’î B.Z de eşîrên bi navê Albayî, ji stemkariya Etrûskan direvin û ji bo ku xwe biparêzin, Romayê ava dikin.

Albayî piraniya xwe eşîrên koçber ên ku bi lawirvaniyê ve mijûl dibin. Ji bo vê jî, dibêjin ku "Şivanan Roma ava kiriye." Piştre Etrûsk bi Albayan re şer dikin û Romayê ji destên wan derdixin. Etrûsk, Romayê li gorî têgihîna xwe ava dike. Li ser wan hîman jî, rêveberiyê didin avakirin. Lê, bi demê re Etrûsk lewaz dikevin, dema Etrûsk lewaz dikevin Romayî bajêr digirin destê xwe. Piştî rêveberî dikeve destê Romaniyan, ji derveyî Etrûskiyan, pergaleke din didin rûniştandin. Di dema Etrûskan de rêverbirina Romayê bi pergala Qraliyetê tê meşandin.

## 2-Dema Komarê: 510- 27'an B.Z

Bi demê re Roma di qraliyetê senato û meclisên gel jî, ava dibin. Bi vî şêweyî bingehê komarê ava dikin. Dema komara Romayê tê avakirin ev komar hemû gelan nagire nava xwe. Ev komar mirovên feqîr û belengaz ango çîna jêr a bindest nedigirt nava xwe. Ji van civakan re, Pleb dihat gotin. Civakên ku dihatin perçiqandin û tu maf ji wan re nedihat dayîn, civakên Pleb bûn. Ev bêmafiya ku dihat kirin, rê li ber nerazîbûn û serhildanên Plebiyan vedikir. Plebî ji bo ku Roma baştir û demokratir were birêvebirin, têkoşînên pir mezin dan meşandin. Tam negihîştibin encamên xwe jî, lê bi demê re hinek guherandin hatin çêkirin.  Mînak: Di salên 450'yan B.Z de, zagonên "12 tablêtan" hatin avakirin. Ev zagon ji bo hemû hemwelatiyan bûn. Têkoşîn û berxwedaniya Plebiyan ji bo civakên demokratîk, gaveke bingehîn dabûn meşandin.



Senatoya Romayê

## 3-Dema Imparatoriya: 27 B.Z - 395 P.Z



Sezar

Komara Romayê roj bi roj mezin dibe û ber bi imparatoriyeke mezin ve diçe. Di dawiya sedsalên berî zayînê de Sezar êrîşên xwe li ser Galya (Fransa), Rojhilatê Deryaya Spî û Anatolya ber bi dawiyê ve dibe û Misr dikeve bin desthilatdariya Romayê. Misr, weke herêmekê bi Romayê ve tê girêdan. Roma piştî demekê û şûnde ji komarê derbasî imparatoriyê dibe. Roma bi çanda Grek pir bandor dibe. Weke tê zanîn Grek çanda xwe ji Mezopotamya, Anatolyayê digirin, li ser van berheman sentezeke çandê didin avakirin û pir pêşketinên dîrokî bi xwe re diafirînin.

### Pirsên nirxandinê:

1- Dewleta Bajarê Romayê, çawa tê avakirin?

2- Di dema komarê de, şêweyê rêveberiyê çawa bû?

3- Romayiyan çanda xwe ji kê girtine? Lêkolîn bike.

4- Bersiva rast hilbijêre.

-Demezrênerê imparatoriya Romayê
A) Antonyos B) Sezer C) Agostos bû

-Hilweşandina Bajarê Romayê di sala
A) 467 P.Z. B) 476 P.Z. C) 746 P.Z. bû

-Hilweşîna imparatoriya Bîzansî, di sala
A) 1443 P.Z. B) 1453 P.Z. C)1455 P.Z. bû

## LI HEMBERÎ KOLEDARIYA IMPARATORIYA ROMAYÊ BERXWEDANÊN GELAN

Li hemberî çewisandinên giran ên imparatoriya Romayê, li gelek deran nerazîbûn, serhildan û berxwedanên gelan dest pê dikin. Beşek ji van berxwedanan ên koleyan e, beşek jî, berxwedanên olî ne. Berxwedanên olî piraniya xwe navenda wan, Rojhilata Navîn e. berxwedaneke olî ji aliyê Hz.Îsa Ve tê pêşxistin. Pir caran li hemberî stemkarî û zoriya imparatoriya Romayê têkoşîn kirine û li ber xwe dane.




Di nava van serhildanan de ya herî mezin û ya ku navê xwe li dîrokê xistiye serhildana koleyan a Spartakus e. Pêşengiya berxwedana Spartakus kiriye di sala 73'yan B.Z de ye. Lê mixabin serhildana Spartakus tê desteserkirin û bi deh hezaran mirovên kole, tên kuştin.

**Pêşketinên Hatine Çêkirin**

### 1-Zagona Romayê ya 12 Tabletan


Imparatoriya Romayê di salên 451-449'an B.Z de zagonên 12 tabletan berfireh dike. Ev weke zagonên Romayê dikevin pratîkê. Di gelek sazî û dezgehên Roma û Xiristiyanan de, ev zagon hatine bikaranîn. Bi taybet li welatên rojava, ber rexên ava Derya Spî ve bi sedê salan ev zagon hatine bikaranîn.

Di salên 250 B.Z heya salên 250 P.Z de, di navbera van pêncsed salan de, li rojhilata navîn bi taybet jî li kurdistanê, hin bajar-dewletên xwedî taybetmendiyên cuda derketine. Taybetmendiya wan:

1- Senteza Rojhilat-Rojava ne.
2- Ji misr, qefqasiya, îran, grek, anatolya û herêmên derdorê, mal û fikrên heyî tên pêşkêşkirin.
3- Gelê kurd, ermen, lûvî, helen û semîtîk li van herêman bi hev re şaristaniyekê ava dikin.
4- Gelê kurd di van şaristaniyan de, gelê ku bi çandinî û lawirvaniyê ve mijûl bûye. Gelên din jî bi bazirganî û pîşesaziyê ve mijûl bûne.

Bi vê wateyê, di dîroka mirovahiyê de mînaka senteza yekem hatiye avakirin. Dîroknasan di dîrokê de, zêde wate nedane vê pêvajoyê. Lê ew bi xwe pêvajoyeke girîng û bi wate ye.

## 1- KOMAGENE (COMMANGENES)


Antiochus

Komagene bi koka xwe binavkirineke Helenî be jî, lê wateya xwe ya kurdî jî heye. Qraliyeta Komagene li derdora sala 250 B.Z û sala 100'î P.Z li Semsûra (Adîyaman, bakurê Kurdistanê) îro jiyaye. Heya Meletî, Riha, Mereş û Elezîzê bandor kiriye. Peyva ‘kom’ hîna jî, ji bo komên nîv-koçer û cîwarê wan bi wateya zom tê bikaranîn. Peyva ‘gen’ jî, bi wateya nijad, qebîle û eşîre tê bikaranîn. Komagene tê wateya cihê eşîrên nîv-koçer.

Dîrok tu carî nebûye şahidê sentezeke çandan a ev qasî mezin. Roja me ya îro jî, di navê de ev wisa ye. Belgeya herî berbiçav û hîna zindî ya vê rastiyê, xirbeyê goristana Qralê Komagene Antiochus a li Çiyayê Nemrûdê ye. Ev Qraliyeta bihêz a wê demê navenda wê Semsûr e. Paytexta wê demê, bajarê Samosatê (bakurê Kurdistanê) bû ku di binê ava Feratê de maye. Gora li Çiyayê Nemrûdê yek ji ser-samhênerên (mat) cîhanê ye û ji ber ku vê rastiyê tîne zimên, sembola senteza Rojhilat-Rojava ye. Cara Yekem e ku senteza Rojhilat-Rojava tê pêşxistin, ev dihêle ku bandora xwe li ser zanist, bawerî û şêweyê hizrandinê, bandoreke mezin bide avakirin. Bilindbûn û mezinbûna Romayê diyar e ku li ser van bingehan, bawerî û hizirandinan xwe ava kiriye. Li ser vê şopê meşiyaye û pêşketina xwe bi wate kiriye.



## Civaka Komagene:

Li gorî lêkolînên ku hatine kirin, tê dîtin ku Komagene pir girîngiyê dide girêdana xwînê, malbat û klanan. Jiyaneke pir bi aramî dijiyan. Pîşekarî, ji bav derbasî zarokan dibe. Zarok perwedeya xwe ya destpêkê li cem dayîkên xwe dibînin. Dayîk perwerdeya wan dişopînin. Ji bo perwerdeya zarokan a ku rahîban didan zarokan, bûtçeyek tê cudakirin. Di pergala Komagene de nêzîkatî ji jinan re li ser bingehê wekheviyê ye. Jin û mêr xwediyê heman mafan in. Ev rastî nomos (namos-zagonên pîroz) bi şêweyekî vekirî hatiye eşkerekirin. Di zagonên Komagene de ji bo dizî û ji derveyî zagonan tevgerkirin, şansê lêborînê tuneye. Civaka Komagene di aliyê hunermendî, oldarî û civakeke mirovî avakirinê de di navbera rojhilat û rojava de sentezeke nû dide avakirin.

## Di Dema Komagene de Aborî:

Bazirganî ji bo Komagene çavkaniyeke bingehîn e. Komagene navendeke bazirganiyê bû. Komageneyî, hatin û çûna li ser çemê Ferat û Torosê xistibûn bin kontrola xwe û bazirganên ku ji derve dihatin, di wan deveran re derbas dibûn, ji wan bac kom dikirin. Bazirganên Komagene bi rehetî li ser axên Persan derbasî Hindistan û Çînê dibûn û ji vir tiştên pir binirx û buha tanîn. Li cihekî bi navê samatê ev tişt difirotin Romayiyan, Persan û Ereban. Di heman demê de li ser axên Komagene, daristanên sedîran hebûn, ev jî ji bo aboriya Komagene dewlemendiyeke mezin bû.

## Di Dema Komagene de Huner:


Gelê Komagene hunereke xwe ava kiriye. Ev huner jî, ji senteza hunera Med-Pers û Grekan pêk dihat. Huner ji aliyê hunermend û zanyarên "ku ji aliyê qral ve dihatin parastin", bi pêş dixin. Peykerên li Nemrûdê hunera Komagene didin diyarkirin.



Antiochus

## Çiyayê Nemrûd û Peyker

Li Anatolyayê li ser girikên bilind cihên baweriyê, perestgeh hatine avakirin. Di hemû şaristaniyan de cihên baweriyê li ser çiyan, girên bilind hatine avakirin. Cihên ku girên bilind û çiya lê nebe jî, bi xwe cihên weke girên bilind çêdikirin û li ser van



Çiyayê Nemrûd

giran jî, perestgeh didan avakirin. Nemrûd li ser rêzeçiyayên Torosê ya bilindahiyeke 2150 metre ye û li ser riyên çemê Feratê, li ser deştan desthilatdarî dida avakirin. Di vê wateyê de, Nemrûd di Anatolyayê de cihekî herî kevnar û ronak digire. Weke cihê baweriyê jî, dikare were binavkirin. Li ser çiyayê Nemrûdê xwedayên-qral hatine nîgarkirin. Ev gir der-ketin û avabûna rojê bi hişmendiyeke bedew dide nîşandan.

**Pirsên nirxandinê:**

1- Komagene, tê çi wateyê û li kû derê jiyane?

2- Komagene xwediya çandeke pir mezin û dewlemend bû, çi vê piştrast dike?

3- Perwerdeya zarokan di Komagene de çawa dihat meşandin?

4- Di Komagene de, rewşa jinê çi bû?

5- Komagene, aboriya xwe ji kû digirt? Lêkolîn bike.

6- Di warê hunerî de, Komagene ji kê bandor bûne?

## 2- PALMYRA:

B.Z derdora salên 250 û şûnde, li bakurê Şamê ya Sûriyeyê (Tedmura îro) hatiye avakirin. Yek ji bajar-dewletên wê demê yên herî xurt e. Navenda bazirganiyê ye. Di nava xwe de asteke demokrasî pêş xistiye. Ji bo wê jî li hember êrîşên romayî û hêzên din bi sedê salan li ber xwe daye û ser piya maye. Şerên di navbera Sasaniyan û Romayiyan bandoreke neyînî li ser şaristaniya Palmyra kir. Di nava demê de lewaz bû û P.Z 268'an de, di dema qiralîçe Zenûbiya de romayiyan ew şaristanî rûxandin.

Mînaka Zenûbiya ji bo wê demê mînakek balkêş e û bi awayekî karekterê şaristaniya Palmyra dide. Ji ber ku qiralîçe Zenûbiya di navbera imperetoriyan de siyaset û diplomasiyeke balkêş dimeşîne. Di şaristaniya Palmyra de kesayeta herî girîng e. Weke jineke di nava emperetoriyên koledar de bi salan berxwedaniyê dimeşîne. Di encamê de rêveberiya wan têk diçe û Zenûbiya dîl tê girtin. Lê belê mîrata ku ji mirovahiyê re hiştiye, pir girîng û binirx e.

## 3- ABGAR:

B.Z derdora salên 230- P.Z 250, li bajarê Rihayê bakurê Kurdistanê ava bûye. Taybetiya wê ya şaristanî weke Palmyra û Komageneyê ye. Riha ji dema Asûrî û Babiliyan û pê ve her dem weke navendeke bazirganiyê ye. Di dema şaristaniya Abgar de jî ew taybetiya xwe parastiye. Gelê Aryen û Semîtîk li vê herêmê ew şaristanî pêş xistin. Lê belê di encama êrîşên romayiyan de têk çû.

## DEMA IMPARATORIYA SASANIYAN(227-651):

Xanedaniya Sasaniyan, piştî hilweşandina xanedaniya Partan tê avakirin. Xanedaniya Sasaniyan, di destpêka sed-sala 3'yan de li Îrana îro herêma Persîsê bi pêşengiya Ar-deşêrê I. hatiye avakirin. Ardeşêrê I. koka xwe ji rahibên xwedawendên Anahîta ye. Xanedaniya Sasaniyan ji aliyê Ar-deşêrê I. li Persîsê (pars-fars) bajarê İstaxar hatiye avakirin. Li gorî lêkolînan, navê Sasaniyan ji navê bapîrê Ardeşêr ê bi navê Sasan tê. Sasan rahibê perestgeha xwedawenda Anahîta ye. Ardeşêrê I. di nava çend salan de, nav-çeyên Sîstan, Goran, Xora-san, Merw,(Tirkmenistana îro) Belx û Harezmê dagir dike û imparatoriyê ji aliyê bakurê rojava ve berfireh dike.



Ardeşêrê I.

### Sînorên Sasaniyan:




Xakên Sasaniyan

Sînorên Sasaniyan ji Îrana îro, Iraq, Ermenistan, Efganistan Kurdistana Bakur, Sûriye, Pakistan, Qafqas, As-ya Navîn û Erebîstanê digire. Di dema rêveberiya Xusrewê 2. de (590-628 P.Z) Misr, Urdun, Filistîn û beşeke ji Libnanê, demekê dibin fermandariya Sasaniyan de dimînin. Sasanî imparatoriya xwe bi navê Îranşehr (bajarê farisan) ango, welatê Îraniyan (Ariyan) bi nav dikin.

## Ol û Baweriya Sasaniyan

Di xanedaniya Sasaniyan de ji bo bikarin desthilatdariyeke xurt bimeşînin, Rahibên Magî (mag bawermendên Zerdeşt in) bi navê ola Zerdeşt, desthilatdariya xwe zêde dikin. Ji bo ku Magî bikarin pergala xwe bidin rûniştandin, hemû rê û rêbazan bi kar tînin. Baweriya Zerdeşt weke ola fermî tê pejirandin. Di dema Sasaniyan de rahibên olî dibin xwediyê desthilatdariyeke mezin. Hemû nîvîsên Zerdeşt ji nû ve tên berhevkirin û tên nîvîsîn. Lê belê ev rahib dema ku nîvîsan amede dikin û dinîvîsin cewherê ola Zerdeşt diguherin. Li gorî berjewendiyên desthilatdariya imparatoriya Sasaniyan, nivîs tên amedekirin.

Ev koma rahibên Magî jî, bi riya olê desthilatdariya Sasaniyan didin rûniştandin. Lê piştî demekê û bi derketina ola Manî, ola Sasaniyan a fermî hejandineke mezin dijî. Di navbera bîrokrasî û xwediyên axê de pevçûn tên jiyîn. Rahibên Magî ku xwe bi ola zerdeşt bi nav dikirin, Manî ji bo xwe weke xeteriyekê dibînin. Ola ku Manî pêş xistî, senteza hemû ol û baweriyên wê demê ne. Manî dibin parastina Şapûr de dixwest ola xwe berfireh bike û bandorî li ser Sasaniyan kiriye. Plansaziyên Şapûr ji bo pêşketina imaparatriya Sasan, pir bûn. Pir bajar ava kirin. Beşeke koçberên Romayê li van bajaran hatin bicihkirin. Ev gelên ku derbasî van bajaran


Manî

dibûn li gorî baweriyên xwe tevger dikirin. Baweriyên xwe azad dijiyan. Du bajarên bi navê Bîşapûr û Nîşapûr, bi navê Şapûr hatin binavkirin.

Şapûr bi taybet pir girîngî dida pêxamber Manî; ew diparast û dihêla ku bi awayekî azad bîrdozîya xwe belav bike, di heman demê de têkiliyên Şapûr bi Cuhuyan re jî baş bûn. Ev taybetmendî û rêbazên Şapûr ji bo rêvebirina xanedaniya Sasaniyan, destkeftiyên mezin ava kirine.

**Pirsên nirxandinê:**

1- Damezrînerê imparatoriya Sasanî, kî bû, li kû derê ava dibe?

2- Sînorên imparatoriyê bi nav bike.

3- Rahibên magî kî bûn?

4- Dema ku rahibên magî nivîsên Zerdeşt ji nû ve nivîsîn, çi guherîn tê de çêkirin?

5- Bi derketina Ola Manî re, çi derdikeve holê?

## PIRSÊN NIRXANDINA BEŞÊ

**1-** Sînorên konfederasyona Medan, destnîşan bike?

**2-** Bandora ola Zerdeştî li ser konfederasyona Med, çi ye?

**3-** Nêzîkatiya Persan li hemberî Medan, çawa bû?

**4-** Encamên şerên Pers û Grek – Yewnanê, binivîse.

**5-** Bandora çanda Helenîzm li ser Rojhilata Navîn, çi ye?

**6-** Sînorên imparatoriya Îskender, destnîşan bike.

**7-** Sasanî, kî ne?

**8-** Hinek ji berhemên Komagene, binivîse.

**9-** Palmyra xwedî girîngiyeke çawa bû?

# FERHENGOK

| | |
|---|---|
| Kronolojî | Rêzkirina bûyeran a li gorî dema qewimîna wan. |
| Statîk | Sekane, ango weke xwe dimîne, naguhere. |
| Dîroka Kronolojîk | Li pey hev rêzkirina bûyerên dîrokî. |
| Mîtolojî | Zanista efsaneyan |
| Fosîl | Bermahiyên ku ji zindiyên destpêkê mane û bûne kevir. |
| Totem | Sembola baweriyê ya destpêkê. |
| Bendav | Benda ku didin pêşiya avê. |
| Dîzik | Xilik, sindan, kûp ên ku ji bo av û xwarinê tên bikaranîn. |
| Etnîsîte | Nijad, etnîk, ango koka gelan. |
| Deklarasyon | Bi nivîskî veguhestina hizirê. |
| Kîl | Cureyeke axê ye. |
| Gêç | Cureyek kevirê spî ye. |
| Sifir | Kanzayeke sor e. |
| Şef | Serokê qebîleyê |
| Kolonî | Cihê ku ji hêla hêzekê ve hatî dagirkirin. |
| Kategorî | Çîn, ango tebeqe. Bo mînak: çîna serdest, nûneriya desthiladariyê dike. |
| Etnolojî | Zanista ku lêkolînan li ser jêdera nijadan dike. |
| Teolojî | Zanista ku vekolînan li ser ol û pirtûkên olî dike. |
| Raçandın | Rêsîn, hûnandin, ji çêkirina cilan re raçandin tê gotin. |
| Pîramîd | Ew avahiyên ku bi awayekî hiyararşî hatine girtin, weke pîramîdên Misrê. |
| Geometrîk | Amrazên Endazyariyê. |

| | |
|---|---|
| Tampon | Parêzk, mewziyên li ser sînoran. |
| Komagene | cihê eşîrên nîv-koçer. |
| Bac | Pereyên ku weke alîkarî bi hêza zagonan tên stendin. |
| Astronomî | Stêrknasî, zanista ku rewş û bûyerên asmanî vekolîn dike. |
| Diyarde | Xuyanek, tişta/ê ku heye, yan diqewime, yan tê kirin. |
| Sedîr | Cureyeke daran e. |
| Mag | Navên rahîbên zerdeştî Mag bûn. |
| Burokrasî | Çîna serdest. |
| Merasîm | rêûresm, dêlindêz |